Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1157 | 3-Nîsan-2024 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Rêwîtiya ber bi jiyan, hezkirin û hevaltiyê ve



Komîteya Çand û Hunerê ya PKK'ê, di salvegera 15'emîn a şehadeta Halîl Dag de, ew bi bîr anî û wiha got: "Tevî hemû rewşên giran û 'bêderfet' dikarîbû karên dîrokî biafirîne."

Qehremanê pêşeng, hunermendê mezin û hevalê dilvîn Halîl Dag, rojeke wek îro, sala 2008'an di kemîneke artêşa tirk de jiyana xwe ji dest da. Lê wî jiyana xwe tev li paş xwe, weke mîrateyeke giranbuha hişt. Bi enerjiyeke zêde û hezkirineke bêdawî, li bilindahiya çiyayan 13 salan kedeke bêhempa da. Ew bû Xelîlê nivîskar, wênekêş, sînemager, Xelîlê şoreşger, gerîla, hevrêyê Rêber APO; Xelîlê Çiya; Dostê çiyayan. Ji xwe Xelîl di zimanê erebî de wateya xwe dostê herî nêz e. Ew jî dostê herî nêz, hevalê herî durist û dilvînê çiyayan bû.

Heval Xelîl, jiyaneke layiqî navê xwe derbas kir. Digot, 'Kamereyeke me heye û hevaltiyeke me heye.' Wan jî têra wî dikir ku hemû çîrokên dilê xwe û dilê çiyayan bîne ziman. Bêhedan germahiya jiyanê, gurbûna şer, xatirxwestinên bêwext, ken û coşa gerîlayan û bîrhatinên wan nivîsandin. Di kêliyên herî germ ên şer de amade bû; dîmen û nûçeyên nayên jibîrkirin ragihandin; eniyeke nû ya şer vekir. Wêneyên gerîlayan 'bi dilê xwe kişandin'; awirên çiyayî, bîranînên wan, hest, bawerî û xewn, doz û sozên wan ji me re hiştin. Bi filmên xwe çîrokên ku lê çûbûn, zindî kirin. Helbest nivîsandin; bi hestên xwe yên nazik, bi kûrahiya fikir û bîrdoziya xwe, estetîka jiyana gerîla kir wêje.

Heval Xelîl ji çiyayan hez kir, çiya û çiyayiyan jî, ji wî hez kir. Li zinarên asê, dolên kûr, lûtkeyên li ezmanan, li kap û kazên çiyayan geriya; li hemû çîrokên veşartî û nîvcomayî geriya. Kêliyên wendakirinê, yên dilgiranî û xemgîniyê bi awayekê xwerû dîtin, jiya û dîmenên wan girtin, ew nemir kirin. Di kêliyên şer, çalakî, serkeftinê de jî amade bû; di rêwîtî, şevbuhêrk, dîlan û stranên gerîlayan de amade bû. Bi av, ax û agirê çiyayan re jiya û ji xwezaya wan hez kir. Bi her awayî bû Xelîlê Çiyayî; wisa dikarîbû sînemayeke çiyayî çêbike. Tevî hemû rewşên giran û 'bêderfet' dikarîbû karên dîrokî biafirîne. Sînemaya Çiyayî, sînemaya Xelîlê Çiya bû. Sînemaya Heval Xelîl jî, sînemaya Çiyayê Kurdistanê bû; sînemaya lehengî û bedewiya kurdan; sînemaya azadiya kurdan, kurdê Azad bû. Sînemaya kurdê nû, yê qehreman ku xwe ji rewşa 'objeyeke' dîrokî rizgar kiriye û bûye kirdeya jiyana xwe; xwebûna xwe pêk aniye.

Heval Xelîl, di jiyana xwe de mînaka hevaltiyê bû. Di nivîs û filmên xwe de her dem cihekê cuda dida jinên kurd ê Azad û Tevgera Azadiya Jinan. Lê ji cihdayînê wêdetir, bû nêrîna wê û digot; "Divê jinên kurd bi fikra xwe bikare têkeve sînemayê û bi çavên xwe li vê cîhanê binêre. Ew çavên wê yên mezin, xweşik û awirên wê yên ku objetî rûxandî, awayê têgihîştina wê ya mirov û cîhanê dikare ji sînemaya kurdan re pêşengiyê bike."

Heval Xelîl hezkerê jiyanê bû; jiyana azad. Hezkerê gerîla, çiya û Rêber APO bû. Her tim hewl dida ku layiqî soza xwe ya bi Rêber APO re be. Di nivîsên xwe de behsa kelecaniya xwe ya wan kêliyên ku bi Rêber APO re derbas kirine, dike. Bi sekneke Apoyî têkoşîn û meşa xwe bi salan li çiyayên azad dewam kir.

Ew qasî jî ji rêwîtiyê û Bakur hez kir. "Rêwiyên Çiyayê Araratê" navê projeya wî ya dawî bû. Bi gerîlayan re derbasê bakurê welêt bû û ber bi bilindahiyan ve çû. Ew wisa her bilind û bilind wê biçe.

Soz û erka me, domandina rêwîtiya wî ye; rêwîtiya ber bi çiyayan, Rêper Apo û azadiyê ve. Rêwîtiya ber bi sînemaya xweser, xwecih, çeleng û azad ve. Rêwîtiya ber bi jiyan, hezkirin û hevaltiyê ve.

Weke heval û şopdarên Heval Halîl Dag, em dibêjin ku Halîl Dag nemir e."

# Seyrangeha Solax li Şengalê

Seyrangeha Solax ku di quntara çiyayê Şengalê de ye, pêşwazî li xelkê herêmê û geştiyarên Mûsilê dike. Ji ber aramiya li Şengalê û bi hatina biharê re serdanên bo seyrangehê her diçe zêde dibe.

Bi vegera gel re û aramiya li Şengalê serwer dibe re, seyrangehên Şengalê jî geş û xweş dibin. Îsal ku li gorî van salên dawiyê baraneke xweş li Şengalê barî, seyrangehan jî rengareng kiriye. Yek ji seyrangeha herî qelebalix a Şengalê Solaxe. Gundê Solax ku ji ber di quntara çiyayê Şengalê de ye û bi xwezaya xwe ya xweşîk û ava xwe ya zêde tê zanîn, di heman demê de wê kiriye seyrangeh jî. Gundê di quntara çiyayên bilind û derdora wê de dol û gelî hene, gelek çavkaniyên avê jî têde hene û rûbarokên biçûk jî diherikin. Ji ber vê xwezaya xwe ya xweş timî bala xelkê herêmê kişandiye ser xwe.



Xelkê Êzidî yê Şengalê û Erebên Şengalê di werza bihar û havînê de ji bo derbaskirina demeke xweş bihevre, pîrozbahiyên malbatî û geştê serdana Solaxê dikin.

Solax ku di heman demê de ser bi navenda Şengalê ye, dibe sedem ku xelkê Telaferê û yê Mûsilê jî ji bo geştê serdana wê bike. Lê ji ber niha remezane zêdetir di nava mehê de xelkê Êzidî serdana seyrangehê dike.

Welatiyê bi navê Semîr Feysel ê serdana Solaxê kiriye, diyar kir ku ne tenê xelkê Êzidî welatiyên Ereb jî serdana seyrangehê dikin û dazanîn, Solax hem biharê hem jî havînê gelek xweşe û bala geştiyarên herêmê û bi taybet jî niştecihên Şengalê dikişîne ser xwe.

Semîr Feysel da zanîn, kî bixwaze hinek bêhna xwe vede û hewayeke paqij bigire, berê xwe dide Solaxê û got: "Rewşa vir gelek başe û weke hûn jî dibînin hejmareke zêde ya xelk serdana vir kiriye. Hêvî dikin herkes ji bo paqijgirtina vir hişyar nêz bibe û dema hatin li gel xwe kîsên çopê bînin."

Sudoku: Bersiv 69

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 7 | 5 | 1 | 8 | 6 | 3 | 9 | 2 | 4 |
| 8 | 3 | 2 | 4 | 1 | 9 | 6 | 5 | 7 |
| 9 | 4 | 6 | 7 | 5 | 2 | 3 | 8 | 1 |
| 5 | 2 | 8 | 1 | 9 | 7 | 4 | 3 | 6 |
| 3 | 6 | 7 | 2 | 8 | 4 | 1 | 9 | 5 |
| 1 | 9 | 4 | 6 | 3 | 5 | 2 | 7 | 8 |
| 4 | 8 | 5 | 9 | 2 | 1 | 7 | 6 | 3 |
| 2 | 1 | 3 | 5 | 7 | 6 | 8 | 4 | 9 |
| 6 | 7 | 9 | 3 | 4 | 8 | 5 | 1 | 2 |

Sudoku:Pirs 70

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | 1 | | 9 | | | | 4 |
| | 9 | | 1 | | 6 | | 7 | |
| | 6 | 5 | | | | | 2 | 1 |
| | | | 8 | | | 3 | 4 | 6 |
| | | | | 1 | | | | |
| 8 | 3 | 7 | | | 9 | | | |
| 3 | 5 | | | | | 4 | 9 | |
| | 4 | | 7 | | 2 | | 1 | |
| 1 | | | | 3 | | 2 | | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Derewan weke libên tizbiyan berdide:**
- Bi heman wateyê.

**Derewên wî bi rê ve diçin:**
- Bi heman wateyê.

**Derew kat nadin:**
- Derewên te pir eşkere ne; derewên te pir mezin in; tu pir derewan dikî.

**Derewên wî aşek pê digere:**
- Çi bêje jê bawer neke; ti caran tiştekî rast nabêje; çi bêje derew e.

**Diçirîne lê nadirû:**
- Derewan dike û wan pîne jî nake.

**Dinya bi tiran bûya wê hemû behra keran bûya:**
-Tişt bi derewan nabin; pirsgirêk bi derewan çareser nabin.

**Eger derewan şax hebûna wê bi serê te ve hatibûna:**
- Derewên te pir eşkere ne; derewên te pir mezin in; tu pir derewan dikî.

**Ew bêje reş e, tu bêje spî ye:**
- Mirovekî derewker e; bila baweriya te pê neyê.

**Ew bêje sibe ye, tu bêje êvar e:**
- Bi heman wateyê.

**Heta rast geriya derewê cihê xwe girt:**
- Heta hat fêmkirin ku ne rast e, her kesî bawer kir ku rast e; êdî bandora rastiyê nema.

**Ji aş were, serî bi ard be jê bawer neke:**
- Çi bêje jê bawer neke; ti caran tiştekî rast nabêje; çi bêje derew e.

**Ji ber betanê ûrê xwe diavêje:**
- Derewan dike.

**Kortika derewan e:**
- Derewên wî naqedin; pir derewan dike.

**Kûreh e:**
- **Derewên wî** eşkere ne, beloq in. Weke dûyê kûrha hesinkaran derewên wî jî zû eşkere dibin.

**Li ser lingan berda:**
- Dereweke eşkere kir.

**Lawê derewîn carekê dixwe firavîn:**
- Kesê derewam bike carekê dikare yê li hemberî xwe bixapîne; kengê be wê derewa wî derkeve; derew nayên veşartin.

**Ma vir bi kaviran in:**
- Derewan dike.

**Mala virekan şewitîbû ti kesî bawer nedikir:**
- Dema mirovekî virek tiştekî rast jî dibêje ti kes jê bawer nake.

**Mî bûn kavir, kavir jî bûn vir:**
- Soza xwe bi cih neanî; gotinên wî derew derketin.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## 'YPJ'ê bû vejîn û nasnameya jinên azadîxwaz'



YPJ`ê 11`e salên tijî têkoşîn û destkeftiyên mezin li pey xwe hişt. Di dirêjahiya van salan de şervanên YPJ`ê bûn hêz û nasnameya jinên kurd û jinên azadîxwaz yên cîhanê.**R-2**

## KCK: Kurdistanê rê neda faşîzma AKP-MHP'ê



KCK'ê destnîşan kir ku Kurdistanê rê neda faşîzma AKP-MHP'ê, gelê kurd di hilbijartinan de li dijî tecrîda Îmraliyê, siyaseta înkar û qirkirinê helwesteke zelal raber kiriye û got: "Divê her kes îradeya gelê kurd bibîne û li gorî wê tevbigere."**R-3**

Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1157 | 3-Nîsan-2024 | www.ronahi.net/ku/

## '4'ê Nîsanê roja vejîna gelê kurd û jinê ye'



Berdevka Yekîtiyên Jinên Êzîdî li Rojava Hediya Şemo diyar kir ku roja rojbûna Rêber Apo rojeke watedar e, ji bo gelê kurd û jinan roja vejînê bû. Herwiha Hediya Şemo dest nîşan kir ku fikr û ramanê wî azad in û hemû gelên cîhanê bi azadiya fîzîkî ya Rêber Apo bang dikin.**R-5**




Roja 4'ê Nîsanê roja ji nûve zayîna civakî, çandî, fikrî û jiyana azad e. Zayîna Rêber Apo ji zayîneke fîzîkî wêdetir zayîneke, civakî, siyasî, fikrî û bîrdozî ye. Di şexsê Rêber Apo de zayîna gelekî û ji zayîna gelekî, zayîna hemû gelan pêkhat. Rojbûna Rêber Apo di Rojhilata Navîn û cîhanê de, ji bona gelan serdemeke nû, jiyaneke nû, felsefeyek nû, fikrekî nûjen û rastiya mirovê azad e.**R-6**

## 'Di rastiya Rêber Apo de perwerde weke şerekî ye'



Endamê koordînasiyona (TEV_DEM) Ayid Ibrahîm diyar kir ku di rastiya Rêber Abdullah Ocalan de perwerde weke şerekî ye û wiha got: " Bi rêya perwerdê mirov dikare çareseriyê ji hemû zehmetiyên jiyanê re bibîne û xwe di aliyê hişmendiyê de pêşbixine da ku karibe xwe ji zîhniyeta kapîtalîzmê rizgar bike."**R-4**

## 'Azadiya Rêber Apo azadiya jin, civak û xwezayê ye'



Endama Komîteya Ekolojîk a Kongra Star Mîdiya Yûsif diyar kir ku Rêber Apo yekem mirove felsefeya Azadiya jinê û parastina xwezayê derxist holê û di pratîkî de jî destkeftiyên pir girîng ji bo civakêafirand, lewma azadiya Reber Apo azadiya jin, civak û xwezayê ye.**R-7**

Rêber Apo avakerê jin û jiyanê ye — Nehîr pale — R-2
Rêxistina demokrasiyê têkoşînê dixwaze — Zekî Bedran — R-5

Rêveberiya Civakî û Herêmî — Rohat Bulut — R-6

Pêşbirka Helbesta Kurdî ya Ciwanan — Kemal Necim — R-7

# ‘YPJ’ê bû vejîn û nasnameya jinên azadîxwaz’

YPJ`ê 11`e salên tijî têkoşîn û destkeftiyên mezin li pey xwe hîşt. Di dirêjahiya van salan de şervanên YPJ`ê bûn hêz û nasnameya jinên kurd û jinê azadîxwaz yên cîhanê. Berdevke Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) Roksan Mihemed diyar kir ku bi saya ked û têkoşîna Rêber Apo YPJ`ê hat damezrandin û ji bo tevahiya jinên azadîxwaz bû pira azadiyê.

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Di nava dîroka her gelekî de jinên şerker ku artêş bi rêve birine, serokatiya êlan kirine, şûrê xwe hildane û di qada cengê de şer kirine, hene. Têkoşîn wan jinan di roja îro de li Rojavayê Kurdistanê bi pêşengiya şervanên Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) mayînde dibe. Destpêka sala 2011`an bi destpêkirina Şoreşa Rojavayê Kurdistanê re jin beşdarî nava Yekitiya Xwendekarên Kurdistanê bûn. Sala 2013’an bi damezrandina Yekîneyên Parastina Gel (YPG) re hejmara jinan di nava hêzên leşkerî de zêdetir bû, ji ber vê tabûrên taybet ên jinan hatin avakirin. Yekemîn tabûra jinan li Kantona Efrînê bi navê Şehîd Rûken 13`ê Sibata 2013`an hat ragihandin, duyemîn tabûr bi navê şehîd Edalet li kantona Qamişlo di 9`ê Adara 2013`an de hat ragihandin û sêyemîn tabûra bi navê Şehîd Dîcle li kantona Kobanê di 24`ê Adara 2013`an hat ragihandin. Di 2-4`ê Nîsana 2013`an de şervanên jin yekemîn konferansa xwe li bajarê Dêrikê li dar xistin. Di konferansê de Yekîneyên Parastina Jin YPJ’ê hat ragihandin.

Di nava van salan de YPJ’ê bi lehengî berxwedaniyeke mezin li hember êrîşên çeteyên DAIŞ’ê, artêşa Tirk a dagirker û komên çeteyên din ku hewl dan Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dagir bikin, nîşan dan. YPJ’ê bi pêşengiya jinên Kurd xwe di hemû bajaran de bi rêxistin kir, paşê ji gelek pêkhateyên din bi taybetî jinên Ereb tevli nava refên YPJ’ê bûn. Hêzên YPJ’ê dîroka bi hezaran salan a jinan ji nû ve zindî kir û careke din bi hêza xwe dikaribû hebûna jinan ji tarîtiyê xilas bike. Îro YPJ’ê mohra xwe li dîroka jinan daye û bûye îlham ji tevahî jinên Rojhilata Navîn û cîhanê re.

Roja 4`ê Nîsanê rojbûna Rêber Abdullah Ocalan e, ev roj ji bo Gelê Kurd zayîna jiyana nû ye. Li ser vê bingehê Yekîneyên Parastina Jin biryar dan ku di 4`ê Nîsanê de hêzeke xweser ava bikin û bi vîneke azad, bawerî û cesaret jinan biparêzin. Di vê çarçoveyê de berdevke Yekîniyên Parastina Jin (YPJ) Roksan Mihemed ji Rojnemeya me re axivî.

**‘4’ê Nîsanê roja vejîn û jidayikbûne hemû jinan e’**



Roksan Mihemed di destpêka axaftina xwe de salvegera damezrandina YPJ`ê li tevahî jinan û gelê azadîxwaz pîroz kir û wiha got: “Roja 4`ê Nîsanê salvegera damezrandina YPJ`ê di heman demê de roja rojbûne Rêber Abdullah Ocalan ne, roja vejîn û jidayikbûne hemû jinan e. Ev felsefa û piradîgma îdolojî ku Rêber Abdullah Ocalan pêşkêş kiriye ji bo hemî gelan û bi taybet ji bo jinan binerxe û bi taybeta ku em hebûn û xwebûne xwe nasbikin, her wiha hêz, dîrok û nasnemeya xwe nasbikin. Ji bo vê jî ev roj roja jidayikbun û vejînek nûye. Damezrandina YPJ`ê di 4`ê Nîsanê de, pêwîstiya ku hatiya damezrandin ku guhertin û veguhertin di hindirê civakê de bide avakirin, di ware fikir, îdolojî, çandî û civakî de guhertin bide çêkirin. Ji ber ku hemî sîstemên desthiledar di ware fikir, fîzîk, dîrok, nasnema û hebûne gel de siyaseteke pir qirêj dane meşandin ku dixwestin gel dûrî rastiya xwe bikevin. Ji ber vê jî ev guhertin pêwîst dikir, siyasetên ku li ser jin dihat meşandin.”

**YPJ`ê ji bo jinên cîhanê bû hêz û bawerî**

Roksan bal kişand ser girîngiya damezrandina Yekîniyên Parasyina Jin (YPJ)`ê û bi serfirzî wiha got: “Armanca damezrandina Yekîniyên parastina jin YPJ`ê ew e ku parastina mafê gelê herêmê, destpêkirina tekoşîna azadî û mafê jinê, pêkanîna adelatê di hindirê civakê de, her wiha me taybet jin kir hedefa xwe, ji ber ku ji hemû mafê xwe hatibû qutkirin û gelek sînordar mabû, guhertinên hebûn pêwîst dikir ku were çareserkirin ji aliyê YPJ`ê ve ku di warê fikir, felsefî û leşkerî de guhertinek were çêkirin. Bi destpêkirina şoreşa 19`ê Tîrmehê re, pêwîstiya ku me dît, parastina rewa bû ku civakeke demokiratîk û îkolojîk ava bikin. Yekîniyên Parastina Jin YPJ`ê wê çawa karîbû cûdabûne xwe ji artêşên din bide çêkirin; helbet ev di hemû cîhanê de hate raberkirin ku ji destpêka damezrandina wê û heya roja îro pîvanên me ji xwe re esas girtin hem di warê demokiratîkbûna civakê, wekhevî, edalet, îkolojî û azadiya jin de bû. Her wiha pêwîst bû ku em wekî jin xwebûne xwe hîsbikin û nasbikin ku çawa em jin bi fikir, îradeya û nasnemeya xwe tevî vê şoreşê û teoşînê dibin. Ev jî ji bo serfiraziye ku îro YPJ`ê den vede li tevahî cîhanê û bû hêz ji hemî pêkhateyan re.”

**‘YPJ`ê bû sembola azadiyê û rizgariyê li tevahî cîhanê’**

Roksan Mihemed di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: “Şoreşa 19`ê Tîrmehê guhertine pir mezin da çêkirin ku îro jin di hemû qadan de cihê xwe digire, di hemî cîhanê de rengê jinê derneket pêş û hete ku girîngî ne didan jinê, lê şoreşa Rojava guhetina ku çêkir, jin ji nû ve vejîn kir û bû naskirin û azadiya hemî cîhanê. Di şerê Kobanê de YPJ`ê di wê şerî de serkeftin têde mesoger kir, her wiha li hemberî çeteyên DAIŞ`ê şer kir ku artêşên mizin û xwedî teknîk nikarîbûn li hemberî DAIŞ`ê şer bikin. Bi pêşengtiya YPJ`ê çeteyên DAIŞ`ê li Kobanê hatin şikandin û dawîkirina wan hat. Yê rola herî mezin ku di şer de leyist YPJ`ê bû, fermendar û şervanên YPJ`ê di vir de sekin, fikir, îrade, îdolojî, cesareta xwe û şerê ku daye meşandin, her wiha bi wê berxwedanê û wê hêzê ku bi girêdana axa xwe ve û welatparêziyê ve Kobanê û hemî herêman hatin rizgarkirin ji çeteyên DAIŞ`ê. Ji ber vê yekê êdî YPJ`ê bû sembola azadiyê û rizgariyê li tevahî cîhanê.”

**‘4`ê Nîsanê vejîna jiyana nû ye’**

Roksan diyar kir ku 4`ê Nîsanê zayîna jinên Kurd e û wiha domand: “Me bi saya bîrdoziya Rêber Apo hebûna xwe bihêztir kir, ji ber vê roja 4`ê Nîsanê roja zayîna gelê Kurd e. Bi taybetî weke jin heger em binirxînin, ji zayîna gelê Kurd zêdetir 4`ê Nîsanê ji bo me jinan vejîna jiyana nû ye. Damezirandina YPJ`ê di heman dîrokê de ye, ji ber vê 4`ê Nîsanê ji bo me xwedî girîngî û wateyeke mezin e. Ez weke kesayet nasname, hebûn, fikir û vîna xwe di nava refên YPJ`ê de dibînim. Ji lewre çawa ku Rêber Apo kedeke mezin ji bo me jinan da, em ê weke şervanên YPJ`ê ji bo azadî û parastina civaka xwe têbikoşin.”

**‘Jin dikaribû zincîra koletiyê bişkîne’**

Roksan Mihemed serkeftinên ku Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) bi dest xistine wiha anî ziman: “Avakirina şoreşa Rojavayê Kurdistanê bi pêşengiya jinên Kurd pêk hat, ji ber feresata xwe ji neteweya demokratîk digirt. Bi hezaran pêşengên jin, bi hêviya şoreşa Kurdistanê pêk were bedelên pir mezin dan û YPJ’ê jî li Rojavayê Kurdistanê li ser vê felsefeyî meşiya. Destkeftiyên ku ketin destên YPJ’ê di gava yekem de Neteweya Demokratîk ava kir. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê gelek sazî û dezgehên ku neteweya demokratîk esas digrin hatin avakirin. Ev gav di nava civakê de bingeh û hêviyek mezin ava kir ku hemû pêkhate cihê xwe di pergala Neteweya Demokratîk de digrin. Şoreşa Rojavayê Kurdistanê eşkere kir ku civak vedigere ser koka xwe. Îro jin dikarin bi awayekî rehet zincîrên koletiyê bişkînin û weke çemekî bêsînor biherike. Bi pêşengiya jinên Kurd şoreşa Rojavayê Kurdistanê bûye navneteweyî.”

**YPJ bû hêviya hemû jinan**

Berdevka YPJ`ê Roksan Mihemed di dawiya axaftina xwe de girîngiya rola Yekîneyên Parastina Jin di nava civakê de wiha anî ziman: “YPJ`ê ji bo hemû jinan bû cihê baweriyê, meraqa jinan di nava YPJ’ê de heye. Çima bi taybetî roja damezrandina YPJ’ê di 4’ê Nîsanê de ye? Ji ber hebûna Rêber Apo hebûna tevahî jinan e. Jinan artêşa xwe avakirin û xwedî li parastina tevahî jinan derketin. Ji bo vê jî ev damezrandin ji bo jinan nûbuneke. Di nava şerê Efrînê, Serêkaniyê û Girê Spî de YPJ`ê rola xwe lîst. Di heman demê de bi bîr û bawerî li hemberî dewleta Tirk û çeteyên wê şer dikin, di nava şeran de rengê jinan li pêş e. Dema gel li artêşbûna jinan mêze dike wê demê bandoreke mezin dide avakirin, dema dijmin bi çavên xwe dibînin jin li hemberî wan şer dikin wê demê tirs bi wan re çêdibe. Çeteyên DAIŞ’ê jî di nava şer de digotin divê em bi destên jinan neyên kuştin, bi taybetî dema dengê tilîliyên jinan dihatin.”

## Ji Pênûsa Jin

### Rêber APO avakerê jin û jiyanê ye

**Nehîr Pale**

Zîhniyeta baviksalarî du rê didan pêşiya jinê yan koletî yan jî mirin. Eger jin koletiyê hilbijêre yan jî mirinê hilbijêre, di encama her duyan de wê dawî li hebûna wê were. Jin bimrê jî, ji gotinan xilas nabe û eger sax bimîne û radestî desthilatdaran bibe dîsa rihetî jê re nîne. Di her pêvajoyekê de jina koletî pejirand bi rêbazên cûda ji aliyê mêr ve hatiye bikar anîn û ew rêbaz heyanî roja îro ji aliyê desthilatdar ve têne bikar anîn. Bi taybet jinên ku dikevin xefka mêr de jinên nezanin ku nikarin xwe biparêz in.

Rêber APO di navbera koletî û mirinê de rêya jiyanê nîşanê jinê da, ji bo jin birûmet û azad bijî divê wê riya zirav ku di navbera mirin û koletiyê de ye, hilbijêr e. 68 sale ku Rêbertî li dijî zîhniyeta cinsiyetparêziyê têdikoşe. Di destpêka salên heftê de jin tevlî partiyê bûn, ji malbatê qutbûn û ciyê xwe di nava xebatên rêxistinî de girtin. Qutbûyîna jin ji malbatê şoreşeke herî mezine û gava destpêkê ya têkoşîna jinê bû. Di salên heştê de artêşbûna jin gava duyemîn a têkoşînê bû û niha berferehtir bûye. Rêber APO li pey hevdû berê jinê da heqîqetê.

Li ser asta cîhanê jî sala 1848`an tevgerên jin dest bi têkoşînê kirin, lê belê zêdetirî xwe jinên karker bûn û daxwaza wekheviya di navbera jin û mêr de dikirin û qanûnî têdikoşiyan da ku jin jî di hilbijartinan de dengê xwe bidin. Ne tenê jinên karker pirsgirêkên wan hebûn, pirsgirêkên hemû jinên cîhanê hene û hîna çareser nebûne. Wextê ku saetên kar ên jinên karker kêm bibe yan jî jin di hilbijartinan de dengê xwe bidin têrê nake ku pirsgirêka cinsiyetparêziyê çareser bibe yan jî zîhniyeta mêrê desthilatdar were guhertin. Rêbazên têkoşîna tevgerên jin ên li hemberî sîstema baviksalarî ne têrker bûn. Heyanî niha jî rêbazên tevger û rêxistinên jin têrê nakin ku jin bibe xwedî îrade û hebûna xwe biparêze.

Rêber APO di çareserkirina pirsgirêkên civakî de rol û misyoneke mezin da jinê. Ji bo dîroka jin lêkolînên gelekî girîng kirin û têkildarî jin bi belge agahiyên girîng derxistin holê. Çanda xwedawendan ku mêr tucarî destûr nedida têkildarî wê agahî eşkere bibin, êdî Rêbertî li tevayî cîhanê belav kir. Dîroknas sala 1960 têkildarî jin hinek agahî dan û ew jî gelekî sînordar bûn. Heyanî niha tevayî dewletên cîhanê li dibistanên xwe de cîh nadin dîroka jin an jî têgehekî wisa nadin bikar anîn. Tiştekî bi navê Dîroka Jin tine ye û dema dibîhîzin matmayî dimînin. Her wiha li Rojhilata Navîn hemû pîvanên di bin navê exlaq û ol de li ser jinê hatine ferz kirin û her tişt li jinê qedexekirine an eyb hatiye dîtin, Rêber APO ew qalib şikandin. Êdî pîvanên jina baş û xurt têne guhertin, berê jina bêdeng di nava civakê de meqbûl bû, niha jina bêdeng zeyîf tê dîtin, li gorî civakê jina teqlîda mêr dike xurt bû, lê niha ew jin di nava jinan de nayên qebûl kirin. Êdî jina têkoşînvan û berxwedêr ku dibe xwedî helwest mînak tê dîtin.



# ‘Azadiya Rêber Apo azadiya jin, civak û xwezayê ye’

Endama Komîteya Ekolojîk a Kongra Star Mîdiya Yûsif diyar kir ku Rêber Apo yekem mirove felsefeya Azadiya jinê û parastina xwezayê derxist holê û di pratîkî de jî destkeftiyên pir girîng ji bo civakêafirand, lewma azadiya Reber Apo azadiya jin, civak  û xwezayê ye.

**Lîloz Hisên/ Qamişlo**

Platforma Jin a Ekoloji ya Rojava ji bo tevlîbûna pêngava “Ji Rêber Apo re azadî , ji pirsgirêka kurd re çareserî”, herwiha li dijî qetilkirina jinan û talankirina xwezayê jî, li ser asta kantona Cizîrê kampaniyaya çandina daran da destpêkirin.

Derbarê kamopaniya çandina daran de, Enadama Komîteya Ekolojîk a Kongra Star Mîdiya Yûsif ji rojnameya me re axivî.

Mîdiya Yûsif di destpêka axaftina xwe de wiha got: “Her sal em kampaniya li dijî çolbûnê daristanan li dar dixin, di heman demê de jî îsal me di dîroka 9’ê Çileya 2024’an  de di çarçoveya tevlêbûna pêngava “Ji Rêber Apo re azadî, pirsgrêka  kurd re çareserî” ev kampanî da destpêkirin. Drûşmeya sereke ya kampanya me”Ji bo hebûna xwe li hember qirkirina jin û  xwezayê li ber xwe bidin û xwe bigihînin azadiyê!” bû.

Enadama Komîteya Ekolojîk a Kongra Star Mîdiya Yûsif wiha pê de çû: “Weke Platforma Jin a Ekolojîk ya Rojava me ev kampaniya ji bo jinên ku hatine qetilkirin û xwezaya ku li her derê cîhanê (li Parîs, Hîndîstan, Îran, Rojava û hwd.) hat talankirin û xerakirin pêk anî. Di heman pêvajoyê de jin û xweza rastî koletiyê tên, xweza jî weke jinan bê can û bê ruh hat îlan kirin. Jîndar nedihat hesibandin. Weke felsefeya kuantûmê pêş neketin ku ji bilî mirovan her tişt bê ruh û madî dihat dîtin. Lêbelê, di civakên yekem de, perspektîfa anîmîst her tişt zindî dît.”

Mîdiya Yûsif di gotinên xwe de wiha bibîr xist: “Di du sedsalên dawî yên kapîtalîzmê de qetlîamên xwezayê du qat zêde bûne, gihiştine lûtkeyê. Niha herkes jin û xwezayê weke madeke qirkirinê dibîne. Kampanyaya me pêşî li berevajîkirina vê perspektîfê ye herwiha hewil dide fikir, felsefe û perspektîfa Reber Apo a ji bo azadiya jin û xwezayê bi taybetî di vê sedsalê belav bike. Ji ber ku di dîrokê de gelek feylesof û Rêber bi nêrîneke cîhana madî nêzî jin û xwezayê bûne.”

Enadama Komîteya Ekolojîk a Kongra Star Mîdiya Yûsif di gotinên xwe de îşaret bi vê yekê kir: “Reber Apo cara yekem hem felsefeya azadiyê ya jinê hem jî xwezayê diparêze û di pratîkê de derdixe pêş. Lewma azadiya Reber Apo azadiya jin û xwezayê ye. Bi gotineke din, em dixwazin perspektîfa feraseta desthilatdariya baviksalarî-dewletparêz a ku di bingehê nêzîkatiyên çewt ên ji bo çareseriya pirsgirêkên ekolojîk û her wiha pirsgirêka azadiya jinê de, ji holê rakin. Ev kampanya di vî warî de ji bo Rojava bû destpêkek.”

Mîdiya Yûsif wiha da zanîn: “Em dixwazin li Rojava civakeke bi xwezayê re lihevhatî ava bikin û perspektîfa wê pêş bixin. Ji bo vejîna xwezaya ku qada me ya jiyanê ye û keskkirina Rojavayê, li dijî çolbûna pergala baviksalarî ya desthilatdar-dewletparêz, hemû jinên Rojavayê bi armanca parastina av û axa xwe bi destên xwe şitlên daran amade kirin. Îro her jinek li Rojava welatê xwe bi amadekirina şitlek li hemberî darên zeytûnê Efrîn û daristanên Şırnak-Cudi yên hatine qetilkirin diparêze û bi keda xwe diafirîne.”

Enadama Komîteya Ekolojîk a Kongra Star Mîdiya Yûsif got ku di 4`ê Nîsanê de  ev kampaniya bê qedandin û wiha domand:  Herwiha nêzî hezar dar wê bên çandin û dema kampanya bi dawî bibe wê daxuyaniyek bê dayîn.



Mîdiya Yûsif diyar kir ku çandina daran giringiyeke mezine dide bejahiyê û wiha gotinên xwe bi dawî kir: “ Gelek sûd tê girtin ji çandina daran jî rê li ber qirêjiya avê digire dihêle av paqijtir bibe, ji ber vê yekê çandina daran û çêkirina daristanan di hewza golên bendavan de xwedî girîngiyeke mezin e wekî din jî ji bo pêşîgirtina li karesatên wekî lehiyê dibin alîkar, guherîna demsalan bi zelalî nîşanî me didin, ava ku ji axê distînin bi şiklê nemê ji pelên xwe berdidin hewayê. Bi vî rengî, ew beşdarî çerxa avê dibin û hewayê şil dikin û dibe ku di pêşîlêgirtina penceşêrê de bibin alîkar; Ji ber ku hucreyên kujer ên xwezayî bi veşartina proteînên antîpenceşêrê dikarin hucreyên tumorê bikujin û şûştina daristanê pergala meya parastinê xurt dike.”

# Li Kurdistanê rastiya ziman

**Rûstem Jiyan**

Dikare bê gotin ku di rêzenivîsa xwe ya beriya niha de me hewl dabû ku hindek behsa têkiliya mirov û ziman bikin, niha jî emê hindek bal bikşînin li ser cureyên wan.

**Zimanê ne bi deng:**

Bêguman mirov xwediyê hêzekî wisa ye ku gelek caran tiştên ku bi dihan ropel nivîs, an bi hezaran peyvên ku nayên îfade kirin, bi lebateke piçûk ya bedenê dikare hest û ramanên xwe bîne ser ziman.

Gelek mijarên ku em nikarin bibêjin hene, bi hezaranin lê bi mîmîkên xwe ango bi tevgerekî piçûk dikarin kesên li derdora xwe bidin hîs kirin ku em çi dixwazin bibêjin, an çi naxwezin bibêjin. Ev jî zimanên bedenê dide îfadekirin. Ger em li gera dîrokê binêrin emê vî tiştî bibînin, ku zimanê bedenê bi emrekî dirêj dewam kiriya.

Zimanê bêdeng ji çend xisleta pêk te, sîmên ku mirov diyar dike û hestên ku têne jiyan kirin. wekî nimûne di rûyê mirovan de gelek komên biçûk ên kas hene. Her yek jî wan îfadeya mercekî dike, yanî objektîf û sobjektîf di diyardeya kêliyê de xwe dide der. Xeydandin, qîrîn, şahbûn û hwd, dide rûyê mirovan. Ev xisos li gel her zindiyekî de îcad dibe, bi mîmîkên xwe dikare peyamên girîng bide kesê/a hemberî xwe. Yanî em dikarin bibêjin ku mîmikên ku bi rû diyar dibe girêdayî vîn û hestên hindirîn yê mirovan in.

Di kurdî de axefinekî pêşiyan heya dibêje: “ dar li ser koka xwe û mirov li ser zimanê xwe şîn dibe”. Dibe ku axeftinekî ji bona gelek kesan ne wa-



tedar be, lê gotineke ku bi awayekî pir baş muhra xwe li dîrokê dide.

Ji bona mijarên ku em tînin ziman baş were famkirin em ê bi hin mînakên din yê girêdayî vê mijarê ve, şîroveyan bi pêşde bibin.

Di sê çerxeya mirov de her demî tesbît hene, hin caran tesbîtê ku têne kirin bi hişmendiyê ve girêdanekî xwe yê girîng heya. Yan jî ji bona tesbîtekî rast hizrekî ji rêzê heye û bi hevokê hebûna xwe dide der.

Hin çaran em di jiyanê de rastî gelek bûyeran tên lê em wê hêzê di xwe de nabînin ku rexneyan bi pêş bixin, ku kesê kêmaniyan jiyan dikin em ji wan re bibin hêza çareseriyê, lê bi giranî îfadeyekî çênabe ku nirxandinê de astengî dikişînin, wê demê tû hêza xwe ya bedenê didî xebitandin, ev bi riya sîmeyên rû dibe an jî bi helwest dibe, di dawî de mijarên ku tû dixwazî bi lêv bikî digihînî wî/ê kesî ku wekî nameya xwe bi kar tîne. Herweha di beşa Tiyatroyê de jî hin caran ji bona ku tû nameya xwe bigihînî kesên te temaşe dikin, Zimanê bêdeng didî bi kar anîn ku ji bona peyama xwe bighînî, hemû organên laş dixî hereketê de, ji vî re jî te gotin (pandomim) ev peyv jî peyvekî yûnanî ye, di wateya çi di jiyana mirovan de çêdibe wekî teqlîd li ser dikê tê pêşkêş kirin.

**Zimanê Danûstandinê**

Dema mirov behsa zimanê danûstandinê dike, yek ser diyalogên ku di navbeyina kesan de çêdibin tê bîra mirov. Di axaftinê de, ji bona kesên hemberî te bi riya dengek ango komek dengên bi mane bikî, peyama xwe radighînî. Ew dibe navgîneyekî peywendiyê di navbera mirovan de ku hest, ramanên xwe tîne ziman. Mirov naxwaze ku sohbetê di vî derbarî de biqedîne, gihandina buyerekî, gotina çîrokekî ango li hemberî girseyekî hîtabet kirin li gorî zanîna xwe bi şikil dike û rengekî digire. Gelek kom mirov hene ku mîna çêran bikin diaxivin. Lê ev rewş di her zimanî de û li her devera dinyaê wisa ye.

**Zimanê Nivîskî**

mirov her demî di dîrokê de hewil dane ku li hemberî pêşketinê bibin xwedî avaniyekî saxlem ku bikaribin xwe bi rêve bibin. Herweha mijara zimanê nivîskî jî heman xisleta, ku mirov îcad kiriya ji bona neslên werin bibin xwedî qenat û newên ji bîr kirin. Her weha mirov di vê derbarê de hiziriya, ku pîwîstiya wî bi tiştekî heya ku were bi bîr anîn, ji bona wê li riyekê geriyane. Ev buye sebeb ku pîwîstî bi nivîsandinê hebe. Li vir xwiya dike heya mirov ji zimanê axaftinê derbasî zimanê nivîsê buye, bi milyonan sal derbas bûne. Zaniyarên arkeologan li ser lewhên kevirî yên ku bi bermahiya mirovan çêbûye, îşaret û resmên çîzkirî dîtine. Bi demê re ferq kirine ku ev resim û îşaretên çîzkirî, bi pergalekî diyarker weke nivîsê hatiya rêzkirin. Bi awayekî domdar ev nivîs bi baweriyekî mezin hatiya çîzkirin. Bê guman nîvîsên heirogirafî zêdetir li misirê hatiya dîtin. Ev jî ji bona şaristaniyê bûye mal û wekî bermahiyê şaristaniya misrê hatiya qebûl kirin.

Di zimanê misrê yê nivîsê de Heirografî wekî şêwazekî fermî ji bona tomarkirina buyeran li ser abîdeyên olî, metênin, dîwaran, parestgihan, peykeran û li ser gureyan hatiye çîzkirin. Niha dema ku artêşa misriyan diçûne seferê her yekî li ser dîwarekî, anog li ser lewheyekî navê xwe dinvîsî ku ji bona ger venegere werê bi bîr anîn. Heta hin kesan sembol didane resimandin. Ev jî dihişt ku di nava civakên misirya kevin de hafîzeyekî xwirt çêbike. Bi vî rêbazî xwestine ku peyamekî bidin mêjûyê, pêşerojê.

Herweha di nava nivîsên misiriyan yê kevin de û herî girîng nivîsandina navê wan, navê Bav,dayik û xwişkan bû. Ji ber wan bawer dikirin ku vejîna li axretê pîwîst e, ji bilî parestina laşê wan navê kesekî diyarker ku hemûyan temsîl dike werê nivîsandin. Yanî wisa dihizrîn ger hîsab werê xwestin jî pîwîste karekî baş hebe ku li bihiştê werê parastin û karê wî yên ne baş were afû kirin.

Di serdema nûjen de dîtina kevirekî bi navê xwe (Reaşt) niha jî ew kevir li mûzexaneya birîtanyê ye, ku ji hêla efserekî firensî ve di hemleyekî de hate vedîtin. Bê guman wî kevirî bandoriyekî mezin li navê misirê kir, ku wekî bermahiyekî misiriyan hate qebûl kirin. Dîtina nivîsa bizmarî wekî destpêka şaristaniyê te dîtin. Ji ber nivîsa bizmarî beriya zayinê bi 4 hezar sal, li misrê hatiya bi kar anîn. Şaristanya Misrê jî mîna yekem şaristaniya ku di dinyayê de tê qebûl kirin.

## Têbînî



### Pêşbirka Helbesta Kurdî ya Ciwanan

**Kemal Necim**

Di nivîseke berê ya vê quncikê de me behsa nifşê ciwanan û xebatên çandî û wêjeyî kiribû. Me gotibû ku çalakî û xebatên çandî ji bo ciwanan derfet û jîngehê peyda dike ku nasnameya xwe ava bikin. Her wiha ji wan re karîn û jêhatîbûnê peyda dike ku karibin bi çandên cuda re têkiliyê bikin.  Xebatên çandî yên ji bo ciwanan di pêvajoya pêşdebirina civakan û bidestxistina pêşketinên ku dibin egera pêşketina civakan, pir girîng û pêwîst in.

Her wiha me behsa wê yekî kiribû ku dûrbûna nifşên ciwan ji çalakî û xebatên çandî û wêjeyê mirov nikare tenê weke rûdaneke asayî lê binêre. Pêwîste weke pirsgirêkekê mirov lê binêre û hewil bide sedemên wê bizane û karibe vî nifşê civakê tevlî nava liv û tevger û çalakiya rewşenbîrî û çandî bike. Ji ber ku windabûn û tunebûna nasnameya çandî ya gelan û civakan ji nifşên ciwanan destpê dike, her wiha ew nifş û çîna civakî bêhtir rû bi rûyê hewldanên pişaftin û asîmlasyonê dimîne.

Di vê derbarê de dawiya hefteya derbasbûyî de xebateke girîng û hêja ji bo nifşên ciwan bi encam bû. Encamên pêşbirka kelbesta Kurdî ya Ciwanan hatin eşkerekirin.

Ev çalakî û xebat çar sal in bê navber berdewam dike. Çalakî sala 2021`an ji aliyê Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê HRRK`ê û bi sponseriya Komeleya Janê Xelef a Xêrxwaziyê li Ingilistanê tê lidarxistin. Pêşbirk li gorî hinek merc û rê û rêbazan tê lidarxistin ku ciwanên ku temenê wan di navbera 18 û 30 salî de ne û nişteciyê Rojava û Sûriyê ne dikarin beşdar bibin. Her salê jî komîteyeke ji pisporên wêje û helbestê tê bijartin ji bo nirxandina helbestan û destnîşankirina navê sê helbestvanên ku hêjayê xelatê de destnîşan dike. Her sal bi dehan helbestvanên ciwan ên jin û mêr ji hemû herêmên Rojava beşdarî vê pêşbirkê dibin û her carê jî bê alîgirî û cudahî ciwanên ji hemû berêman xelatan werdigrin, ji xwe xelatên pêşbirkê jî dirvanî ne, xelat jî her sal bi ahengeke berfereh û beşdariya ciwanan û rewşenbîran û saziyên ragihandinê radestî xelatgiran têne kirin.

Îsa jî ji destpêka salê ve deriyê beşdarbûna pêşbirkê hate vekirin, 36 ciwanên ji hemû herêmên Rojava beşdarî pêşbirka vê salê bûn ji wan 20 jin û 16 xort bûn.

Ji ber ku ez ji destpêka vê pêşbirkê de, ango ji sala 2021`an di nava komîteya nirxandinê de me, min dît çawa sal bi sal hijmar û asta helbestan zêde û bilindtir dibe. Bi taybet vê salê li gorî nirxandin û dîtina endamên din ên komîteyê jî, pir helbestên hêjayî xelatkirinê hebûn lê komîte neçar e ku tenê sê belbestan hilbijêre.

Pêşbirka Helbesta Kurdî ya Ciwanan derfeteke pir girîng û hêja ye da ku ciwan behremendiya xwe pêşkêş bikin, her wiha asoyên afrandinê li pêşiya wan vedike û her ciwanek hewil dide ku bedewtirîn û xweşiktirîn helbest pêkêşî pêşbirkê bike, helbestvanên ku beşdar dibin û yên ku xelata werdigirin dê di pêşerojê de bibin helbestvanên afrêner. Her wiha ev pêşbirk dibe mîna bangekê ji bo hemû sazî û aliyên têkildar ku piştgiriya behremendî û afrêneriya ciwanan bikin.

# BI KURTÎ JIYANA RÊBER ABDULLAH OCALAN

Rêber Abdullah Ocalan, 4'ê Nîsana 1949'an li gundê Amara yê girêdayî navçeya Xelfetî ya bajarê Rihayê hat dinyayê. Zarokatiya Rêber Apo li gundê Amarayê derbas bû. Malbata wî wekî "Malbata Ocê" tê zanîn û paşnavê xwe ji "Ocê" digirin.


Navê dayika Rêber Apo Uveyş e, û navê bavê wî Omer e. Dayika Uveyş di sala 1918'an de hat dinê û di 11'ê Nîsana 1993'yan de jiyana xwe ji dest da. Dîroka jidayikbûna bavê Wî Omer 1900 e. Di 17'ê Mijdara 1975'an de jiyana xwe ji dest da. Dayika Uveyş hevjîna duyemîn a bavê Rêber Apo ye. Ji hevjîna wî ya yekemîn 9 kurê wan çêbûn, feqet hemûyan jî di temenên biçûk de jiyana xwe ji dest dan. Gulsum a ku zaroka wan a dehemîn e, sax ma. Ji ber ku wî û hevjîna xwe ya yekemîn Eyşe li hev nekirin dest ji hev berdan. Li ser vê yekê di sala 1938'an de bi dayika Uveyş re zewicî. Ji vê zewacê heşt zarokên wan çêbûn. Çar xwişkên Rêber Apo; Hewa (1944), Ayn (1946), Fatma (1953) û Kevser (1955) û sê birayên Rêber Apo; Mehmet (1951), Osman (1956) û Alî (1959) ne. Li gorî dîrokên jidayikbûnê rêza xwişk û birayên Rêber Apo wisa ne: Gulsum, Havva, Ayn, Abdullah, Mehmet, Fatma, Kevser, Osman û Alî. Birayê wî Alî di 13 saliya xwe de (sala 1972) jiyana xwe ji dest da.

Rêber Apo, di Îlona sala 1958'an de li gundê cîran ê bi navê Cîbînê dest bi dibistana seretayî kir û domahiya 5 salan li vê dibistanê xwend. Di payiza 1963'yan de li navçeya Nîzîp a Dîlokê dest bi dibistana navîn kir û domahiya 3 salan li vir xwend. Dûvre di sala 1966'an de Lîseya Pîşeyî ya Tapo Kadastroyê ya li Enqerê qezenc kir û li vir xwend. Dema ku li Lîseya Pîşeyî ya Tapo Kadastroyê bû fikrên sosyalîstî nas kir. Di dema lîseyê de piştî ku pirtûka Leo Huberman a bi navê Alfabeya Sosyalîzmê xwend li beramberî Marksîzmê eleqeya wî çêbû.

Di sala 1969'an de lîse qedand û payiza heman salê li Amedê wekî Teknîsyenê Kadastro û Tapokirinê dest bi kar kir.

Ji Lîseya Ziya Gokalp a Amedê dîploma girt û di sala 1970 de Fakulteya Hiqûqê ya Stenbolê qezenc kir. Tayîna xwe jî bir navçeya Bakirkoy a Stenbolê û li vir hem çû zanîngehê hem jî xebitî. Di van deman de rêxistinên Dev-Genç (Ciwanên Şoreşger) û DDKO (Ocaxên Çanda Rojhilat a Şoreşgerî) bi bandor bûn. Rêber Apo bi herduyan re jî eleqedar dibû, encax bi awayekî fermî bû endamê DDKO'yê. Li beramberî Mahîr Çayan, ku yek ji rêberên şoreşger ê demê bû, xwedî sempatiyeke mezin bû.

Rêber Apo xwe gihand dereceya pêwîst a dersan û li ser vî esasî



mafê xwe yê "derbasbûna ufqî" bi kar anî, di payiza 1971'an de derbasî Fakulteya Zanistên Siyasî ya Enqereyê bû. Piştî ku derbasî vê fakulteyê bû sempatiya wî ya li beramberî Mahîr Çayan zêdetir bû. Reva Mahîr Çayan a ji Girtîgeha Maltayê bi gotinên "lehengane bû" anî ziman. Feqet ev reva wan di 30'ê Adara 1972'yan de li Kizildereyê bi qetlîamê bi encam bû û Rêber Apo li dijî vê qetlîamê ji bo çalakiyên boykotê pêşengî kir. Li dijî qetlîama Kizildereyê bi boykotkirin û belavkirina danezanan bersiv da. Ji ber vê yekê di 7'ê Nîsana 1972'yan de hat binçavkirin. Piştî êşkenceya 21 rojan hat girtin û li girtîgeha Mamakê 7 mehan hat ragirtin. Di 24'ê Cotmeha 1972'yan de hat berdan.

Ji zivistana ku sala 1972'yan digihîne 1973'yan û bi şûn de li maleke Enqereyê ya di navbera semtên Bahçelîevler-Emekê de li gel Hakî Karer û Kemal Pîr ma. Gotina "Kurdistan Mêtingeh e" cara yekemîn ji Hakî Karer re got. Ji vê û şûn de bi awayekî fermî ket nava rêxistinkirina koma Kurdistanî. Civîna xwe ya yekemîn li gel wî bi tevlîbûna 6 kesan di Newroza sala 1973'yan de li Bendava Çûbûk a li Enqereyê li dar xist.

Di 8'ê Nîsana 1974'an de rêxistinên ciwanan di asta kongreyekê de civînek li dar xistin û di encama wê de li ser navê Koma Apocî Rêber Apo û Hakî Karer ketin nava rêveberiya Komaleya Hîndekariya Bilind a Demokratîk a Enqereyê (Ankara Demokratik Yüksek Öğrenim Derneği-ADYÖD). Rêber Apo wekî rêveberiya ADYOD'ê xebatên ciwanan ên Tirkiyeyê meşand û li gel vê xebatên koma "Şoreşgerên Kurdistanê" ya ku di 1973'yan de dest pê kir jî zêde kir. Di 4'ê Kanûna 1974'an de dewleta Tirk bi ser ADYOD'ê de girt. 162 ciwanên şoreşger ên li komaleyê bûn hatin binçavkirin. Di nava wan de Rêber Apo jî hebû. Yên hatin binçavkirin piştî hefteyekê hatin berdan. Encax ADYOD di 10'ê Kanûna 1974'an de bi biryara Fermandariya Rewşa Awarte hat girtin.

Di zivistana 1975'an de di destpêka sala 1976'an de Rêber Apo li gel Mehmet Hayrî Durmuş yekemîn gelaleya Manîfestoyê nivîsand. Ev manîfestoya 70 rûpelî wê çaxê nehat weşandin. Dûvre ji bo manîfestoya "Rêya Şoreşa Kurdistanê" bû bingeh. Wekî yekemîn belgeya nivîskî derbasî dîrokê bû û ji bo demê bû materyalê bingehîn ê perwerdeyê. Ji bo ku danehev û têkoşîna azadiyê derbasî Kurdistanê bibe û biryara girseyîbûnê bigire di navbera 31'ê Kanûna 1976'an-1'ê Çileya 1977'an de li maleke li semta Dîkîmevî ya Enqereyê civîneke dîrokî hat lidarxistin. Di vê civînê de biryar hat girtin ku kom bi navê Yekîtiya Ciwanên Şoreşger ên Kurdistanê (Kürdistan Devrimci Gençlik Birliği) xebatan bimeşîne. Rêber Apo piştî civînê ji bo ku karibe fikrên xwe bigihîne Kurdistanê ger û civînên wekî "Sefera Kurdistanê" tê zanîn da destpêkirin û bi rêzê çû bajarên Agirî, Bazîd, Qers-Dîgor, Dersîm, Çewlik, Xarpêt, Amed, Riha û Dîlokê.

Rêber Apo û Kesîre Yildirim, di 24'ê Gulana 1978'an de bi fermî mehra xwe birîn. Kesîre Yildirim, dûvre di Kongreya Sêyemîn a PKK'ê de hat dahûrandin, pratîkên wê yên di nava PKK'ê de hatin mehkûmkirin û statuya wê ya kadrotiyê hat xistin. Di destpêka sala 1987'an de li Atînayê ku ji bo xebatên Ewropayê çibû, bi alîkariya îstixbarata Yewnan reviya.


Rêber Apo di dawiya Gulana 1978'an de çû Amedê û careke din jî li Enqereyê venegeriya. Li bînayeke 4 qatî ya li semta Şehîtlîk a Amedê malek girt û li vir bi cih bû. Di 26-27'ê Mijdara 1978'an de li gundê Fîsê yê navçeya Licê ya bajarê Amedê Kongreya Damezrandinê ya PKK'ê li dar xist û kongreyê Rêber Apo wekî Sekreterê Giştî yê PKK'ê hilbijart. Rêber Apo piştî ku his kir darbeya eskerî nêz dibe derbasî Rihayê bû, li wir domahiya 40 rojan xebat meşandin û di 2'yê Tîrmeha 1979'an de bi dizî ji Rihayê derbasî wî alî sînor Kobanê bû. Dûvre ji bo ku li gel rêxistinên Filistînî peywendiyê deyne ewilî çû Şamê û dûvre jî derbasî Beyrûdê bû. Bi kadroyan re mijûl bû û giranî da xebatên perwerdeyê. Rêber Apo, piştî darbeya eskerî ya 12'ê Îlona 1980 li vê sehayê amadekariyên têkoşîna gerîla meşand. Piştî salên têr û tijî bi Pêngava 15'ê Tebaxa 1984'an têkoşîna PKK'ê gihand merheleyeke nû.

Kongreya Sêyemîn a ku di dîroka PKK'ê de xwedî cihekî girîng e, di 25-30'ê Cotmeha 1986'an de li kampa Helwe ya li Lubnanê hat lidarxistin. Kongre ji aliyê Rêber Apo ve hat birêvebirin. Bi rêka Akademiya Mahsûm Korkmaz ku bi biryara Kongreya Sêyemîn hat avakirin perwerde gihişt asteke akademîk. Bi rêka vê pêngava perwerdeyê ku ji bo bîranîna Mahsûm Korkmaz (Egîd) hat destpêkirin ev xebatên ji bo ku gihandina milîtanên li ser xeta Rêbertiyê hatin meşandin bêyî navber heta sala 1992'yan dewam kirin. Di vê pêvajoyê de dewleta Tirk nakokiyên di navbera Îsraîl û Sûriye-Lubnanê de ji xwe re kir bingeh û ji bo ku Akademiya Mahsûm Korkmaz a li Bekaayê bê girtin zext li van herdu dewletan kir. Li ser vê yekê Akademiya Mahsûm Korkmazê di Tebaxa 1992'yan de perwerde sekinand. Rêber Apo, xebatên perwerdeyê li malên li Şamê domand. Carina komên ku perwerdeyê dibînin li hev civand, nirxandinên giştî pêş xist û nîzama Akademiyê berdewam kir. Di sala 1993'yan de cihê ku ji bo hevalên birîndar lê tedawî bibin û bimînin hatibû girtin bi hin vesaziyên avaniyê wekî dibistan hat veguherandin. Bi vî rengî Dibistana Navendî ya Partî hat avakirin. Dibistana Navendî ya Partiyê yekemîn dewreya xwe ya perwerdeyê di zivistana 1993-1994'an de pêk anî. Ji ber ku dibistan li Şamê bû perwerdeyên pratîkî nehatin dayîn, lê bernameya perwerdeya teorîk bi nîzama Akademiya Mahsûm Korkmaz hat meşandin. Rêber Apo heta ku di sala 1998'an de ji Sûriyeyê derket jî li Şamê ev xebat meşandin.

Di 6'ê Gulana 1996'an de li Şamê li nêzî Dibistana Navendî ya Partiyê seyareyeke teqemenî barkirî hat teqandin û bi vî rengî li dijî Rêber Apo hewldaneke sûîqestê hat pêşxistin.

Komploya Navneteweyî ya ku wekî êrîşa îmhakirina Rêber Abdullah Ocalan hat pêşxistin, biryara DYE, Îngilîstan û Îsraîlê bû. Rêveberiya DYE jî ew plan kir û bi rê ve bir. Di Komployê de rêveberiya Husnu Mubarek a li Misrê, rêveberiyên Yewnanîstan, Rûsya û Kenyayê bi roleke çalak rabûn. Rêveberiya DYE di komployê de pêdivî bi kê ditîbe û jê alîkarî xwestibe ew alîkarî jê girtiye.

## Xwenasîn



### Rêveberiya Civakî û Herêmî

Rohat Bulut

Di navbera rêveberiyên herêmî û yên navendî de her tim pevçûn hene. Civak dixwaze xwe bi rêve bibe û xizmetê li gorî pêdivî û berjewendiyên xwe pêş bixe. Lê belê desthilat jî dixwaze civakê û herêmên civakî bi navendê ve girê bide, li gorî berjewendîyên dewlet û destgilatiyên navendî bi rê ve bibe. Erk û pêwira rêveberiyên herêmî û yên navendî gelek caran tên tevlihevkirin. Em bala xwe didinê, her çiqas rêveberiyên herêmî bi bajaran were nasîn û li ser cewhera şaredariyan xizmeteke civakî pêş bixin jî di bingeha xwe de hemû cihên niştecihbûnê vedihewîne. Em dibînin ku rêveberiyên herêmî, li hemû cîhanê di çarçoveya xizmetguzariya civakî de bi xwe re pergalên cuda derxistiye holê û pêşxistiye. Belê dibe ku dewlet, desthilat û navendî be û rêveberiyên herêmî yanî şaredarî jî parçeyek jê be.

Lê têkiliyên di navbera dewleta navendî û rêveberiyên herêmî li gorî prensîban pêş dikeve. Desthilatî li ser esasê domandina serdestiya xwe siyaset û polîtîkayê pêş dixe, lewma jî neçar dimîn e hebûn û heyîna rêveberiyên herêmî bipejirîn e. Ya girîng ew e ku di çarçoveya berjewendiyên civakî de hevsengiyek pêş bikive. Lê belê, pergalên heyî hewl didin ku têkiliya herêmî-navendê bi piranî bi hin reformên asayî bidomînin. Armanc jê jî ew e ku pergalê di warê desthilatdarî, navgîn û asta nûnertiyê de teng neke û bidomîn e. Li aliyê din aşkera ye ku ji bo civakê pêdiviya rêveberiya herêmî her roj zêdetir dibe. Li gel vê yekê jî têkoşîna ku tê dayîn divê bi zanistî û têgihiştî be. Lewre di têkoşîna guherîna vê pergalê de pêwistî bi nasîna pergalê, xitimîna wê û her wiha pêşxistina çareseriyeke alternatîfî heye. Bi taybetî jî di warê hişmendî de pêwitî bi guherînên bingehîn heye.

Dema em bala xwe didinê dibînin ku li dewletên federal, têkiliya di navbera hukûmeta federal û hukûmetên herêmî de ji dewleta unîter cuda ye. Di vî warî de her pergal ji bo ku îsbat bike ku pêkhateya civakî ya herî guncav e û bipejirîne, ji analîza civakî bigire heta analîza siyasî serî li gelek rêbazan dide. Lê belê, ji bo pergalê nêzîkbûna demokrasiyê û rêveberiyên herêmî di bingeha xwe de li gorî serdestî, asta egocentrîzmê (xwenavendî) û berjewendiyên xwe ye. Li gorî wê di tercîhên xwe de guhertinê dike û nêzîkî çareseriya pirsgirêkan dibe. Di vî warî de çi di asta herêmî-navendî de û çi jî di asta şaredarî û nêzîkatiya çareserkirina pirsgirêkên bajaran de her tim pergal û rêveberiyên navendî li gorî xwe nîzîkatiyekê nîşan didin. Di bingeha xwe de dewlet û desthilat derfetên di dest de parve nake û ew feraseta ku hertiştî ji dest nede her tim di xwe de dihewîn e. Di rastiya xwe de ev rêbazê meşandina şêwazê wê yê siyeseta desthilatî ye. Lê belê ji bo civakê ya herî guncav di ser şaredariyan de pêşxistina xizmetê û xwe rêve birin e.

Dema em li rista şaredariyan û xizmeta wan a civakî dinêrin, girîngiya wan xwe bi zelalî dide der. Şêweya rêxistinî ya şaredariyan, hêz û erkên wan, li gorî siyaseta civakî pêş dikeve. Hin welat hene ku erk û hêza rêveberiyên herêmî qels û bêwate dikin û bi dewlet û navenê ve girê didin.



# KCK: Kurdistanê rê neda faşîzma AKP-MHP'ê

**KCK'ê destnîşan kir ku Kurdistanê rê neda faşîzma AKP-MHP'ê, gelê kurd di hilbijartinan de li dijî tecrîda Îmraliyê, siyaseta înkar û qirkirinê helwesteke zelal raber kiriye û got: "Divê her kes îradeya gelê kurd bibîne û li gorî wê tevbigere."**

**Navenda nûçeyan**

Hevserokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê têkildarî encamên hilbijartinên 31'ê Adarê yên li Tirkiye û Kurdistanê, daxuyaniyeke nivîskî da.

KCK'ê di daxuyaniya xwe de diyar kir ku serketina gelê Bakurê Kurdistanê bi dest xistî hemû parçeyên Kurdistanê kêfxweş kiriye, hemû gelê Kurdistanê bi vê serketinê serbilind e û wiha got: "Serketina dîrokî ya di hilbijartinên xwecihî ya 31'ê Adarê de di têkoşîna azadiyê ya gelê Kurd de li cihekî girîng bi cih bûye û têkoşîna azadiyê ya gelê Kurd xurt kiriye. Bê guman di vê pêvajoyê de tevkariya yên ku berpirsyarî girtine û ked dane, ji bo vê encama dîrokî diyarker bûye. Me hemûyan dît ku kedeke bê hempa hat dayîn. Ji xwe gelê me encameke dîrokî wergirt û bi rengekî herî baş teqdîra vê kedê da. Em jî van hevalan pîroz dikin. Dîsa em dayikên Kurd, ciwan û jinan pîroz dikin. Sekna jin û ciwanan lîstokên navenda şerê taybet pûç kir, bû sedem ku felsefeya me ya jiyana azad a li ser esasê azadiyê jinê bi ser bikeve."

**'Kurddistanê rê neda faşîzmê'**

KCK'ê da xuyakirin ku di hilbijartinên xwecihî yên 31'ê Adarê de gel li dijî tecrîda li ser Rêber Apo, rejîma qeyûm a ku îradeya gelê Kurd desteser kirî, siyaseta înkar û qirkirinê ya desthilatdariya AKP-MHP'ê helwesteke vekirî û zelal raber kiriye û wiha domand: "Îradeya mezin a di Newrozê de di hilbijartinên xwecihî yên 31'ê Adarê de jî hate nîşandan, gelê Kurd got ku ji tecrîd û faşîzmê re cih nîne û bersiva herî xurt da. Kurdistanê rê neda faşîzma AKP-MHP'ê. Faşîzma AKP-MHP'ê ku 9 sal in nikare serî bi gelê Kurd bide tewandin, gelê Kurd ji Rêber Apo û sekna azadiyê cuda bike û civaka Tirkiyeyê bike dijminê Kurdan, ji civaka Tirkiyeyê jî şeqameke dîrokî xwar û serî bi jêr ve qulipî. Xeta têkoşîna hevpar û yekîtiya demokratîk a ku gelê Kurd bi gelên Tirkiyeyê û hêzên demokrasiyê re pêş xistî, bi ser ketiye. Serketina ji hilbijartinên xwecihî ya 31'ê Adarê hatî wergirtin, pêşketina feraseta netewa demokratîk îfade dike. Feraseta faşîst a netew-dewletparêz têk çûye û feraseta netewa demokratîk ku xwişk-biratiya gelan û jiyana hevpar îfade dike, bi ser ketiye. Lewma ev serketina dîrokî, serketina têkoşîna hevpar e ku gelê Kurd û gelên Tirkiyeyê ev têkoşîna hevpar bi feraseta netewa demokratîk bi hev re pêş xistin."

KCK'ê da zanîn ku hilbijartin di hewirdorek demokratîk de pêk nehatin, bi taybetî jî li Kurdistanê bi temamî di hewirdorek antîdemokratîk de pêk hatiye û wiha domand: "Li Kurdistanê hilbijartin bi temamî di bin zextê de pêk hatin. Jixwe Kurdistan 9 sal in ji aliyê mufetîşên mêtinger ve di bin qanûnên leşkerî de tê birêvebirin. Qayûm tenê aliyekî vê ne. Li Kurdistanê bi temamî hawireke leşkerî-faşîst heye. Hilbijartin di vî hawîrdorê de pêk hat û gel di nav hawireke zext, gef, şantaj û şîdetê de çû hilbijartinê. Bi deh hezaran mirovên weke leşker, polîs, sivîl, memûr û hwd. anîn Kurdistanê û deng bi wan hatine danîn. Ev pêkanîn radixe pêş çavan ku faşîzma AKP-MHP'ê xwedî feraseteke çawa ye û di dijminatiya xwe ya li Kurdan de çiqasî kûr e."

**'Divê her kes îradeya gelê kurd bibîne'**

KCK'ê diyar kir ku helwesta gelê Kurd a di hilbijartinên xwecihî yên 31'ê Adarê de, rola ku lîstiye û serkeftina dîrokî ya ku bi dest xistine divê ji hêla her kesî ve rast were fêhmkirin û wiha got: "Desthilatdariya faşîst a AKP-MHP'ê bi gotin û polîtîkayên nîjadperest, neteweperest, olperest ên li ser bingeha dijminatiya li Kurdan pêk tîne, zerara herî mezin daye Tirkiyeyê. Gelê Kurd û Tevgera Azadiyê ya Kurd bi salan e li dijî vê zîhniyeta faşîst a dij mirovahiyê têdikoşe. Vê têkoşînê encamên dîrokî bi xwe re anî, mîna ku di hilbijartinên dawî de jî hate dîtin, polîtîkayên dagirker û mêtingeriyê ya AKP-MHP'ê hilweşand û desthilatdariya faşîst a li Tirkiyeyê têk bir. Di qonaxa em



gihaştinê de em di wê baweriyê de ne ku wateya têkoşîna gelê Kurd baştir tê fêmkirin. Gelê Kurd hem di Newrozê de hem jî di hilbijartinan de bi awayekî eşkere helwesta xwe nîşan da û da diyarkirin ku divê di zûtirîn demê de tecrîda li ser Rêber Apo were bidawîkirin, azadiya fîzîkî ya Rêber Apo were mîsogerkirin û di çareseriya pirsgirêka Kurd de Rêber Apo were mixatabgirtin. Divê her kes vê helwest û vîna gelê Kurd bibîne. Banga me ji dewletên herêmê û hêzên navneteweyî re ev e; bila tu kes piştgiriya planên AKP-MHP'ê yên ku qirkirina Kurdan kûrtir dike û di navbera gelan de şer û pevçûnan derdixe, neke. Divê her kes îradeya gelê Kurd bibîne û li gorî wê tevbigere."

# Encamên dawî yên şerê Îsraîl û Hemasê

**Navenda nûçeyan**

**Li gorî amarên fermî di encama şerê di navbera Hemas û Îsrailê de ku di 7'ê Cotmeha 2023'an de dest pê kir û heta niha bi hemû heza berdewame, zêdeyî 32 hezar filestînî hatine kuştin, Xeza ji sedî 80'ê wêran bûye û nêzî 2 milyon kes bi birçîbûnê re rûbirû man e.**

Di 7'ê Cotmeha 2023'an tevgera Hemasê ya filestînî li dijî Îsrayilê êrişeke dijwar pêk anî û di encamê de 1200 Îsrayîlî ku di nava wan de jin û zarok jî hebûn hatin kuştin, 543 kes birîndar bûn û 239 îsrayilî ji aliyê Hemasê ve hatin revandin.

Piştî êrişî artêşa Îsrayilê bi awayekî dijwar êrişî Gezayê kir û heta roja îro jî ev êriş û şerê di navbera Hemas û Îsrayî de bi hemû hêza dewam dike

Li gorî amarên fermî di vî şerî de heta niha, zêdeyî 32 hezar û 705 filestînê hatine kuştin û zêdeyî 75 hezar û 190 jî birîndar bûne. Ji wan zêdeyî 13 hezar zarok hatine kuştin. Hewiha 8900 jin hatine kuştin, 23000 birîndar bûne, zêdeyî milyonek jin jî koşber bûne. Herwiha 2100 jin nexuane. 60 hezar jinên ducanî bi nexweşî û kêmxwariniyê re rû bi rû mane.

Li gorî rêxistina Tenduristiya cîhanî zêdeyî 2 milyon filestînî bi birçîbûnê re rû bi rû mane. Serokê Rêxistina Tenduristiya cîhanî rewşa xeza wiha vedibêje,"Xeza bûye navçeya mirinê.".

Li gorî raporên NU Xeza ji sedî 75 hatiye rûxandin û bi sed hezaran filestînî koçberî Refehê bûne û di şert û mercên pir zehmet de jiyan dikin. Di milê tendurstiyê de jî rewşa xezayî pir zehmet bûye û piraniya nexweşaniyên wê ji ber êrişan jikar derketine. Tenê niha nêzî 10 nexweşxaniyan bi awayekî beşkî kar dikin. herwiha pêwîstiya 9 hezar kes bi tedawiya acl heye.

Li aliyekî din hejmara kuştiyên artêşa Îsrayîlê gihişt 600 leşkerî. Herwiha heta niha hejmareke mezin ji îsrayîliyan di destê Hemasê de ne.

**Di rewşa heyî de çareserî nepêkan e**

Geşedanên leşkerî û siyasî yên li Xezayê nîşan didin ku şer ber bi nediyarbûnê ve diçe û hemû senaryo gengaz in, ji ber ku herdu aliyên şer vî şerî wek qonaxeke girîng û dawîn dibînin, ku eger Îsraîl bi ser bikeve dê di encamê de Hemas bi temamî bi dawî bibe û di herêmê de koalîsyoneke herêmî, navneteweyî û erebî bê avakirin û armanca wê koalîsyonê hêzên girêdayî Îranê yên li Sûriye, Iraq, Lubnan û Yemenê ye.

Eger Îsraîl bi ser neket û rewşa Xezayê nehat guherîn jî wê demê Hemas dê vê



yekê wek serkeftinekê li dijî Îsraîlê ragihîne. Di encamê de dibe ku bandor li Lubnan, Sûriye, Iraq û Yemenê bibe nexasim ku di çend rojên dawîn de piştî xîtaba sekreterê giştî yê Hîzbullah Hesen Nesrellah rewşa li ser sînorê Lubnan û Îsraîl tevlihev bû. Di encama analîzkirina borî de diyar dibe ku li pêşiya hewldanên rawestandina şerê Xezayê gelek astengî hene nexasim piştî zêdebûna piştgiriya ji Hemasê re û şermezarkirina êrişên Îsraîlê ku ev ji bo Hemasê baş e.

Pêkanîna van armancan divê bi hemleyeke leşkerî ya mezin be û pê re zexta navneteweyî, erebî û herêmî ya li dijî Îsraîlê dê zêdetir bibe, hem di aliyê çalakkirina hêzên Îranê û vejandina rêxistinên tundraw li Rojhilata Navîn û cîhanê, hem jî di aliyê bandorên siyasî û aborî de.

Tevî ku hemû hêzên navneteweyî û herêmî ji encamên şer tirsiyane lê dîsa jî hemû çareseriyên pêşniyarkirî dûrî rastiyê ne, wek avakirina rêveberiyeke ji aliyê dewletên erebî yan navneteweyî ji bo rêvebirina Xezayê ku ev jî ji bo şêniyên Xezayê dagirkirineke nû ye. Serokê Amerîkayê Joe Biden di çend rojên borî de çareserî pêşniyar kir û tê pêşbînkirin ku ev pêşniyar ji aliyê Îsraîlê ve bên redkirin. Di encamê de alozî kûrtir dibe û çareseriya herî guncaw avakirina pergaleke demokratîk e ku tê de hemû pêkhate cih bigirin, ev jî fikrê neteweya demokratîk e.

# DEM Partiyê 78 şaredarî bi dest xist

DEM Partiyê tevî dek û dolabên desthilatê bi taybetî veguhestina dengên leşker û polîsên li bajarên Kurdistanê jî 3 bajarên mezin û 7 bajar, bi giştî 78 şaredarî bi dest xist.

Li bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê di 31'ê Adarê de bi milyonan hilbijêr çûn ser sindoqan. AKP û şirîkên wê gelek şaredarî winda kirin û CHP û Partiya Wekhevî û Demokrasiyê ya Gelan (DEM Partî) jî serkeftineke mezin bi dest xist.

Li gorî encamên nefermî; AKP'ê şaredariyên 12 bajarên mezin, 12 bajar, 356 navçe û 125 bajarokan bi dest xist.

CHP'ê şaredariyên 14 bajarên mezin, 21 bajar, 337 navçe û 48 bajarokan bi dest xist.

MHP'ê şaredariyên 8 bajar, 122 navçe û 54 bajarokan bi dest xist.

Partiya Yenîden Refahê şaredariyeke bajarê mezin, ya bajarekî, 39 navçeyan û 19 bajarokan bi dest xist.



Partiya Îyî şaredariya bajarekî, 24 navçe û 4 bajarokan bi dest xist.

DEM Partiyê jî 3 şaredariyên bajarên mezin, yên 7 bajaran, 58 navçeyan û 7 bajarokan bi dest xist.

Li gorî encamên nefermî, şaredariyên DEM Partiyê bi dest xistin wiha ne:

**Bajarên mezin**

1.AMED
2.MÊRDÎN
3.WAN

**Bajar**

1.AGIRÎ
2.ELIH
3.COLEMÊRG
4.ÎDIR
5.MÛŞ
6.SÊRT
7.DÊRSIM

**Navçe**

1.COLEMÊRG/GEVER
2.WAN/MIKS
3.WAN/ELBAK
4.WAN/EBEX
5.WAN/ŞAX
6.WAN/ARTEMÊTAN
7.WAN/ERDÎŞ
8.WAN/WESTAN
9.WAN/PAYÎZAVA
10.WAN/RÊYA ARMÛŞÊ
11.WAN/BÊGIRÎ
12.WAN/QELQELÎ
13.WAN/SERAY
14.WAN/TÛŞBA
15.AGIRÎ/GIYADÎN
16.AGIRÎ/BAZÎD
17.AGIRÎ/AVKEVIR
18.QERS/QAXIZMAN
19.QERS/DÎGOR
20.ŞIRNEX/CIZÎR
21.ŞIRNEX/SILOPIYA
22.ŞIRNEX/HEZEX
23.SÊRT/MISIRC
24.BEDLÎS/TETWAN
25.MÛŞ/GIMGIM
26.MÛŞ/KOP
27.MÛŞ/MILAZGIR
28.ERZIROM/QEREQOÇAN
29.ERZIROM/QEREYAZÎ
30.ERZIROM/TATOS
31.MÊRDÎN/ARTÛKLÛ
32.MÊRDÎN/KERBORAN
33.MÊRDÎN/DÊRIK
34.MÊRDÎN/QOSER
35.MÊRDÎN/ŞEMREX
36.MÊRDÎN/NISÊBÎN
37.AMED/RÊZAN
38.AMED/BISMIL
39.AMED/XANA AXPAR
40.AMED/PÎRAN
41.AMED/ERXENÎ
42.AMED/HÊNÊ
43.AMED/ PEYAS
44.AMED/ KARAZ
45.AMED/ PASÛR
46.AMED/ LICE
47.AMED/FARQÎN
48.AMED/SÛR
49.AMED/BAJARÊ NÛ
50.RIHA/BÊRECÛK
51.RIHA/HEWAG
52.RIHA/SERÊKANIYÊ
53.RIHA/XELFETÎ
54.RIHA/HÎLWAN
55.RIHA/PIRSÛS
56.RIHA/WÊRANŞAR
57.XARPÊT/DEP
58.MÊRSÎN/AKDENÎZ

**Bajarok**

1.ÎDIR/XELFELÎ
2.HEZEX /SIRTKOY
3.BEŞÎRÎ/ ÎKÎKOPRU
4.KORKUT/ALTINOVA
5.SEMSÛR/KOMIR
6.ÇÊLIKAN/ SERGOLAN
7.DÎGOR/DAGPINAR
8-ŞIRNEX/GUNDIKÊ MELÊ
9-KOP/ELMAKAYA
10. HAWÊL/WESEL QERANÎ

# ‘Di rastiya Rêber Apo de perwerde weke şerekî ye’

Endamê koordînasiyona (TEV_DEM) Ayid Ibrahîm diyar kir ku di rastiya Rêber Abdullah Ocalan de perwerde weke şerekî ye û wiha got: “ Bi rêya perwerdê mirov dikare çareseriyê ji hemû zehmetiyên jiyanê re bibîne û xwe di aliyê hişmendiyê de pêşbixine da ku karibe xwe ji zîhniyeta kapîtalîzmê rizgar bike.”

**Avêsta Menaf/Qamişlo**

Ev nêzî salekêye ku li bajarê Qamişlo, ji aliyê Tevgera Civaka Demokiratîk TEV_DEM`ê ve komîteyên perwerdê hatine avakirin. Her wiha perwerde jî, xwendina pirtûk û paraznameyên Rêber Abdullah Ocalan in. Her komek perwerdê ji 12`e kesan pêk tê. Armanca endamên wê komê jî ew e ku bi rêya perwerdê hîn zêdetir cewherê xwe nasbikin û bikaribin xwe ji hişmendiya kaptelîzimê rizgar bikin. Ji ber ku dewleta Tirk a dagirker bi hemû rêbazan şerê taybet li ser civakê dide meşandin, pêwîste her mirovek bi rêya perwerdê û bi taybet bi rêya fikir û felsefeya Rêber Abdullah Ocalan xwe ji dehfikên şerê taybet rizgar bike.

Derbarê avakirina komên perwerdeya li ser pirtûkên Rêber Apo û girîngiya vê gavê, endamê Koordînasiyona Tevgera Civaka Demokratîk (TEV_DEM) Ayid Ibrahîm ji Rojnemeya me re axivî. Ayid Ibrahîm diyar kir ku ev nêzî salekê ye wekî komên xwendina pirtûkên Rêber Abdullah Ocalan hene û wiha got: “Ez wekî endamekî di komîteya perwerdê de û di heman demê de wekê mamoste di akademiyê de cih digirim.



Her wiha ev nêzî salekê ye ku me xwest wekî sîstema perwerdê di nava gelên Bakur û Rojhilatê Suriyê de pêşbixin, bi taybet jî li Qamişlo, niha jî wekî kom ji bo xwendina pirtûk û pareznameyên Rêber Abdullah Ocalan hatina avakirin, armanc ji van koman jî ew e ku çanda xwendin û perwerdê di nava civakê de were pêşxistin, ji ber ku perwerde tişta herî girîng e di jiyane mirov de. Rêber Abdullah Ocalan dibêje ji bo jiyana her kesekî ‘perwerde perwerde perwerde’ pêwîste û esas were girtin. Her wiha mirov dikare bi riya perwerdê re hişmendiya xwe biguhere û bibe xwedî hêz, û wiha jî dikare xwe azad bike. Mirov dema ji aliyê perwerdê de lawaz be, wê di tevgera jiyan û karê xwe de jî nezan û lawaz be, bi perwerdê mirov xwe nasdike, birêxistin dike û kar û xebatên xwe jî bi awayekî baş û serkeftî derbas dike.”

**‘Bi fikir û felsefeya Rêber Apo xwe kûr bikin’**

Ayid di berdewamiya axaftina xwe wiha got: “Di destpêkê de, perwerdeyên me di akadimiya Rêber Apo de dihat dayîn, lê beriya salekê di nav komîteyên perwerdê nîqaş hatin kirin û şêwaz hat guhertin. Her wiha li ser asta bajêr me 2 komîteyên perwerdê avakirin, di nava her 2 komîtan de jî, tax bi tax komîteyên perwerdê derbixin ku bi zimanê kurdî, erebî û xiristiyanî bê dayin. Di encama van perwerdan de jî, endamên ku cihê xwe di van komîteyan de digirin, endamên saziyên Rêveberiya xweser in ku ji perwerdê de sûdekî pir mezin digirin. Bê guman ev perwerde care yekeme ku bi kurahiyekî wisa tê dayin û encam jê tê girtin. Berî ku em dest bi perwerdê bikin, her car endamek ji perwerdê xalek ji pirtûkên Rêber Abdullah Ocalan, dinirxîne û li ser nîqaşên kur tên meşandin. Ji ber ku rastî em wekî gelê Rojava naskirina me bi fikir û felsefeya Rêber Abdullah Ocalan re hatiye çêkirin, lê ew naskirina kur tune ye. li ser vê bingihê hewledanên me heye ku hîn zêdetir xwe di fikir û felsefeya Rêber Abdullah Ocalan de kûr bikin.”



Ayid Ibrahîm da zanîn ku her komîteyek perwerdê ji 12 kesan pêk tê û wiha got: “Komîteytên perwerdê û bi taybet girûbên xwendevanên pirtûk û paraznameyên Rêber Abdullah Ocalan, bi fikir û felsefeya Rêber Abdullah Ocalan, wê azadiya Rêber Apo a fîzîkî mesoger bikin û ji civaka xwe re bibin hêz û îradeyek xurt. Em ê van komîteyên perwerdê berfereh bikin ku li Bakur û Rojhilatê Suriyê xebat bimeşînin.”

**‘Perwerde hêza çareseriya mirov e’**

Endamê Kordînasiyona Tevgera Civaka Demokratîk (TEV_DEM) Ayid Ibrahîm di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Em wekî endamên perwerdê, pêwîste ji wiha zêdetir di nava gel de xwe belav bikin û fikir-felsefeya Rêber Abdullah Ocalan bi awayekî kur bidin naskirin. Her wiha di rojên pêşiya me de giran bûnê bidin van komîteyên perwerdê, da ku wekî şerê taybet ku ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve li ser civaka me tê meşandin, bi rêya perwerdê wan vala derbixin, ji ber ku çareserî perwerdeye. Di heman demê de ku em xwe ji aliyê hişmendiyê de pêşbixin û ji bandora zehiniyeta kapîtalîzmê rizgar bikin, pêwîsta em xwe perwerde bikin, ji ber ku di rastiya Rêber Apo de perwerde weke şerekî ye, pêwîsta em vê ji xwe re mînak bigirin.”

# Di nava kêliyên mirinê de avakirina jiyana azad

**Rustem Jiyan**

Dikare bê gotin ku Newroz ji bona gelê Kurd rojeke gelek pîroz û di heman demê de roja qehremaniyê ye. Heya mirov dikare bêje Roja ku împaratoriya Med di nav agirê berxwedana Kawayê Hesinkar de şewq vedaye. Her kes çîroka Newrozê cûda dinase, lê hemû jî biagir ve girêdayîne. Ew agirê Kawayê Hesinkar pêxistiye û di sala 1982’an vê carê agirê berxwedanê di zindana Amedê de bi îradeyek xurt Şehîd Mazlûm Doxan geş û gur kiriye. Çalakiya Heval Mazlûm bandorek gelek mezin dike û têkoşîna wê ya bêhempa li her derî dibe mînak.

Her wiha Heval Mazlûm dibistanê berdide û tevlî têkoşîna azadiyê dibe. Di nav têkoşînê de û bi çalakiyên cûr be cûr cîh digre. Di sala 1979’an de dema dixwaze ji Riha derbasî Qoserê bibe, li Wêranşarê tê girtin û dijmin Heval Mazlûm dibe zindana li Amedê. Heval Mazlûm bi ruhê şerê Alîşêr û Zarîfeyan û bi yekbûyina ruhê



berxwedêr yê Şeyîd Riza’yan li hemberî dewleta faşist û qirker bi berxwedaniyek bêhempa û xurt sekinî, ti caran teslîmiyetê qebûl nake.

Kesayeta Heval Mazlûm kesayetekî çalakvan bû, ji hemû hevalên xwe re zanîstî belav dikir, ji ber ku xwedî kesayetek lêkolîner bû. Bi terz û sekna xwe derdora xwe birêxistin dikir û pêşengtî dikir. Sekna Heval Mazlûm li beramberî zihniyeta dewletê pîvanek berxwedaniyê diyar dikir, ruxmê ku di nav zindanê de bi her awayî zext û işkenceyê re rû bi rû dimîne jî, her hevalên xwe perwerde dike û tu carî ji zextên Esat Oktay Yildiran natirse. Bêdeng bûyinê ti carî qebûl nake, bi felsefeya “Ji bo wî tarîtiyê ronahiyek pêwîste” tevdigere û tevlî jiyanê dibe. Her roj xwe xurtir dike, bi xwesteka destpêkirina greva birçîbûnê dike û li hemberî dewleta qirker disekine. Lê belê heman demî roj bi roj sebra Heval Mazlûm jî li hemberî wê pergala faşîst û qirker kêmtir dibe.

Gelê me, jin û ciwanên Kurdistanê yên ku xwe bi ruhê Newrozê xemilandine, berxwedana xwe ya bêhempa nîşanî dost û dijmin didin ku şopdarên meşa azadiyê ya mezin in ku Mazlûm Doganan daye destpêkirin. Bi şiyara azadiya fîzîkî ya Rêber Apo, Kurdistana azad û Jin Jiyan Azadî nexşerêya sedsalê diyar dike. Ev serhildana ku ji hemû qadan bilind dibe rêya bingehîn a veguheztina mezin diyar dike. Gerîlayên HPG û YJA Starê ku sala 2024’an bi ruhê Newrozê pêşwazî dikin, bi şerê mezin ê li çiyayên Kurdistanê didin asta xwe ya serkeftinê diyar dikin. Şerê gerîla yê ku bi pêngavên serkeftî dijmin wêran dike û êrîşên dagirkeriyê pûç dike, li tevahiya Kurdistanê, herêmê û cîhanê belav dibe û pêvajoyê diyar dike.

Gerîlayên modernîteya demokratîk ku dibe mîna Newrozê, bi îdiaya mezin a têkoşînê ber bi qonaxeke nû ve diçe, bi têkbirina dagirkeran û bi destkeftiyên nû mizgîniya serkeftinê dide. Jinên Kurd ên bi pêşengiya Zekiye, Rahşan, Sema, Ronahî û Bêrîvanan Newrozê pîroz dikin li her qadê, li herî pêş pêşengiya têkoşînê dikin. Rêbertî û têkoşîna jinan di şer, siyaset û veguherîna civakî de serdemeke nû vedike. Rastiya ku hişmendiya serdest a mêr herî zêde jê ditirse, bilindbûna têkoşîna civakî ya ku jin pêşengtiya wê dikin. Dema ku rastiya gelê Kurd a pîrozkirina Newrozê hişmendiya neteweyî diafirîne, jinên Kurd ku Newrozê pîroz dikin bi derbaskirina sînorên neteweyî veguheztina civakî diafirîne. Ev veguheztin bi xwe re têkoşîna me sînorên Kurdistanê derbas kiriye. Di vê wateyê de îro jî li cihê ku şoreşa gelan pêkhatiye Newroz bi rihê şehîdên rojavayê Kurdistanê tê pîrozkirin û êdiaya civaka me girêdan bi mirovan re dide afrandin. Li ser vî bingehî newroza vê salê di gelek aliyên xwe de cihrengî dide diyarkirin. Gel bi xwe xwedî li vê rojê derket û careke din bi rengên xwe yên gelerî diyarkirin ku Kurdistana azad misoger e.



# ‘4’ê Nîsanê roja vejîna gelê kurd û jinê ye’

Berdevka Yekîtiya Jinên Êzîdî li Rojava Hediya Şemo diyar kir ku roja rojbûna Rêber Apo rojeke watedar e, ji bo gelê kurd û jinan roja vejînê bû. Herwiha Hediya Şemo dest nîşan kir ku fikr û ramanê wî azad in û hemû gelên cîhanê bi azadiya fîzîkî ya Rêber Apo bang dikin.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Roja 4’ê Nîsanê ango rojbûna Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan weke rojeke bi wate ji aliyê gelê kurd ve tê naskirin. Herwiha girêdayî heman mijarê jî berdevka Yekîtiya Jinên Êzîdî li Rojava, Hediya Şemo bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn jî wiha bû:

**Roja 4’ê Nîsanê rojbûna Rêber Apo ji bo gelê kurd û bi taybet ji bo jin tê çi wateyê?**

Ger em danasînekê bidin roja 4’ê Nîsanê wê helbet danasîna me ew be ku weke roja vejînê were destnîşankirin. Rojbûna Rêber Apo ji bo me kurdan û bi taybet jinan rojeke nû û dîrokeke nû bû. Ev roj bi taybet jî ji bo me kurdan ne weke hemû rojên din e, ew rojeke pîroz û watedar e. Ji ber ku dema em li ser Rêber Apo diaxivin, tê zanîn ku ne weke axaftina li ser kesayetekî normal e. Rêber Apo ji qonaxa zaroktiya xwe ve xewdî fikr û ramanên azad e, ew ne weke zarokên din bû. Têkilî û danûnstandina wî bi xuşk û dayika wî re li pêş bû ango di zaroktiya xwe de hezkirineke mezin dida jinê û ev yek jî heya roja îro didome. Herwiha Dayika Iwêş jî roleke mezin lîst heta ku kestayetek weke Rêber Apo xwedî kir, helbet rêzgirtina me ji bo wê dayikê re heye. Wê koça dawî kiriye, lê di




wê demê de karîbû Rêbertî li ser fikirên azad perwerde bike û bi awayekî durist danûstandinê bi civaka xwe re çêbike. Lewma Rêber Apo di pêvajoya xwe ya têkoşîn û azadiyê de li dijî serdestên gelê kurd rabû. Gelê kurd gelek şoreş li dar xistin, lê hertim jina kurd dihat kolekirin. Lê firkir û felsefeya Rêber Apo bû bingeha azadiya jinan. Di heman demê de derfetek da jinê ku xwe di hemû waran de bibe xwedî roleke mezin û xwe pêş bixe.

**Fikr û felsefeya Rêber Apo çiqasî weke rêyeke çareseriyê ji bo pirsgirêkên cîhanê tê dîtin?**

Rêber Apo ne bi awayekî jixweber pirtûk nivîsandine an jî firk û felsefeya xwe derxistiye, wî fikrên feylsûf û kesayetên navdar yên mîna Marks, Lîlin, Gîvara û hwd… xwendiye. Di heman demê de nerînên wî dîroka tevahiya şoreşên cîhanê xwendiye û ji xwendin û naskirina rastiya wan şoreşên cîhanê ya şaş, rastiyek afirandiye. Ev rastî jî fikr û felsefeya ku şoreşek ji bo gelê kurd û gelên herêm û cîhanê da meşandin. Herwiha felsefeya xwe ji bo gelan pêşkêş kirye ji bo ku riya xwe ronî bikin. Rêber Apo di axaftinên xwe de dibêje: “Ger hûn ji min fêm bikin, hûn ê bikaribin kar bikin û xwe azad bikin, ger hûn ji min fêm bikin hûn ê hemû tiştan bi awayekî serkeftî bi dest bixin. Dema ku mirov firk û felsefeya Rêber Apo bixwîne wê bikarbe hertiştî bi zelalî bibîne û gavên xwe jî bi rehetî bavêje. Ji ber vê yekê jî ramanên Rêber Apo dengvedaneke li ser asta cîhanê çêkir û gelên cîhanê tev jî ketin bin bandora felsefeya Netewaya Demokratîk. Rast e Rêber Apo rêberekî kurd e, lê gelên cîhanê Rêber Apo ji xwe re jî dibînin rêber.

**Ev bû zêdetirî 3 salan ku tu agahî ji Rêber Apo nayê girtin, hetanî ku ev tecrîd were bidawîkirin, pêwîste gelê kurd û hemû gelên azdadîxwaz çi bikin?**

Wekî em dizanin dema ku komplo li ser Rêber Apo hat kirin, dewleta Tirk a faşist û hêzên komploger xwe kirin yek û xwestin Tevgera Azadiya Kurdistanê jî têk bibin. Dema ku şoreşên kurdan bi têkbirina rêveberan têk dibirin, bi girtina Rêbertî jî xwestin tevger û şoreşa me jî têk bibin. Dewleta Tirk a faşist digot me kurd xistine bin tebeqeyek ji bîtonê û wê nikarbin



xwe ji bin wê derxînin û xwe azad bikin. Lê bi komplo nikarîbû fikir û felsefeya Rêber Apo bi qeyd û zincîr bike. Di roja îro de li ser asta cîhanê pêngaveke mezin ji bo azadiya Rêber Apo didome, gelê kurd û cîhanê tev ji bo azadiya Rêber Apo têkoşînê dikin. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û li ser asta zêdeyî 100 dewletên cîhanê bi azadiya fîzîkî ya Rêbertî bang dikin. Konvedan, meş, daxuyanî, haştag, îmze û hwd… didomin û armanc ji van çalakiyan azadiya Rêber Apo ye. Hemû gelên cîhanê rastiya Rêbertî û gelê kurd nas kirine. Dewleta Tirk a dagirker jî ji aliyê xwe ve hertim gefên dagirkirina Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike û di heman demê de jî tunekirina jinê dike hedefa bingehîn. Ev yek li pêşiya vîna jinan û gelê kurd nabe kelem, lê belê wê hertim bi fikr û felsefeya Rêber Apo berxwedan bidome. Em bi vî hawî jî dibînin ku her diçe ramanên Rêbertî li tevahiya cîhanê bi berfirehî tê belavkirin. Banga gelê kurd û tevahiya gelên azadî xwaz di roja îro de bidawîkirina tecrîda li ser Rêber Apo ye.

## Rêxistina demokrasiyê têkoşînê dixwaze



**Zekî Bedran**

Roja yekşemê li Tirkiyê hilbijartin hatin kirin. Ji ber ku hilbijartin di mercên asayî de pêk nehatin girîngiyek mezin qezenc dike û balê dikişîne. Di serî de hilbijartinên piştî 2015’an heta niha tên kirin ji bo sazîbûna faşîzmê weke amûrekî tên karanîn. Ji ber sedema tifaqa AKP-MHP û Ergenekonê partî nakevin hilbijartinê, li kêleka AKP-MHP’ê rasterast dewlet dikeve hilbijartinê. Hilbijartin di mercên wekhev de pêk nayê. Partiyên weke HDP, DEM’ê ku daxwazên gelê Kurd û demokrasiyê armanc dikin, bi awayekî vekirî weke hedef tên nîşandan û tên vekirin. Tevahî saziyên dewletê, partî û ragihandina dewletê partiyên weke DEM’ê dijmin îlan dikin, dixin kategoriya terorîzmê.

Di hilbijartinên berê hatin kirin de HDP’ê li Kurdistanê nêzî sed şaredarî qezenç kiribû. Li gel tevahî astengiyan û propogandaya reş, gel HDP hilbijart. Gelê Kurd ev salên dirêj e di nava têkoşînek siyasî û berxwedanê de ye. Bi dehhezaran hatine lêpirsînkirin û di girtîgehan de derbas bûne. Berdêl dane, di navenda bûyeran de ne û şahidin. Dizane ku dost û dijmin kîne û dixwazin çi bikin. Gelekî pir bi ceribandin e û tercîhên wê yê polîtîk pir zelal in. Li gel êrişên giran ên leşkerî û derûnî yên Newroza 2024’an jî bi coş û girseyî hat pîrozkirin, ev mînaka herî baş e. Di vî alî de Newroz û hilbijartin vediguherin referandomekî. Dewleta Tirk jî vê bi vî awayî fêm dike. Piştî êrişên giran, girtin, operasyonên leşkerî û propogandaya rewş ji bo bipîve ka gel çiqas ji têkoşînê dûr ketiye, hilbijartin û Newrozan weke diyarkerekî dibîne. Newroza dawî moralê wan pir xirab kir. Ji bo vê jî ragihandina Tirk û derdorên fermî, partiyên muxalefetê jî di nav de kesê qala Newrozê nekir.

Di hilbijartinan de jî bi dehhezaran leşker û polîs kişandin hinek bajarên xeternak û weke hilbijêr bikar tomar kirin. Dikarin vê jî weke hilbijêrên kayyûm pênase bikin. Polîtîka kayyûmê pir teşhîr bû. Tu wateya hilbijartin û vîna gel nemaye. Li şûna vê bi hilbijêrên sexte û veguhestî hinek cihan bidest bixin û xwe xilas bikin. Li gel tevahî zext, fêlbazî û lîstokan mîsogeriya ku dest nedanin ser şaredariyên DEM partiyê tune ye. Ji ber ku faşîst Dewlet Baxçelî peyama desteserkirinê dide.

Ji bo Kurdan jiyana li Tirkiyê û polîtîka meşandin zehmet e. Dema li gel tevahî astengî, zehmetî, fêlbazî û destkeftî tên qezençkirin, yên dewletê rêve dibin serî li lîstok û komployên nû didin. Dewleteke ku li dijî gelê xwe dijminahiyê dike, serî li fêlbazî û komployan dide! Polîsan, istixbarat, dadgehan weke zincîrekî dixe tevgerê. Rêveberiya ku ji ewlehiya can û malê gel berpirsyar e, ew bi xwe ewlehiya can û malê gel ji holê radike. Li gorî zagonên xwe tevger nake. Tecrîda li Îmraliyê li gorî kîjan zagon û hiqûqê ye? Fêlbaziya doza Kobanê bi kîna zagon û dadgehkirinê dikare bê şîrovekirin?

Li Rojhilata Navîn pirsgirêkên civakî giran dibin, şer û pevçûn qet bi dawî nabin, sedemê vê nebûna demokrasiyê ye. Dema di hişmendî û çandê de guherîn pêk neyê her ku diçe nakokî kûr dibin. Rêya guherîn û pêşketinê tê girtin. Hîn zêdetir zext, hîn zêdetir rêveberiya otorîteyê û rêbaz dikevin dewrê. Rejîmên baas ên Iraq û Sûriyê hilbijartin jî dikirin. Lê kî dikare bêje ev hilbijartin bi rikberiyek serbest û mercên wekhev de dihatin kirin? Eger partî bi awayek serbest beşdarî hilbijartinê bibûna û rêveberî bihata guhertin, Iraq û Sûriyê ev pirsgirêkên giran û pevçûn nedijiyan. Heman tişt ji bo welatên din ên Rojhilata Navîn derbasdar e.

Sala borî li Sûriyê hilbijartin hatin kirin. Hema kêm mabû B. Esad dê ji sedî sed qezenç bikira. Ev encam tu têkiliya xwe bi rastiya civakê re tune ye. Li Sûriyê hebûnek gel a homojen tune ye. Çînên cuda û komên berjewendîperest hene. Heman demê de Sûriyê şerek giran ê hindirîn jiya. Ji deh milyonan zêdetir mirov li derve û hindir di rewşa koçberiyê de ye. Yên ku bi rêveberiyê re nakokiyek giran dijîn, di pevçûnê de ne hene. Li gel vê jî çawa dibe ku B. Esad evqas deng digire û qezenç dike. Li tu welatên demokratîk tiştek wiha tune ye. Li Sûriyê derdorek demokratîk tune ye û hilbijartinek ku bernamzet pêşbirkê bikin nehatiye kirin. Dema wisa bibe hilbijartin hêvî û guherînê ava nakin. Pirsgirêk li ser hev tên û giran dibin. Di encamê de rewş ber bi teqînê û pevçûnê ve diçe.

Hikumeta Şamê bersivê nade daxwazên Kurd û kesên li herêmên xweser dijîn. Dibêjin zagon hene, li gorî wê tevger bikin. Ev zagon ji xwe hene. Eger ev zagon ji bo çareseriya pirsgirêkan guncaw bûna çima evqas şer û pevçûn hatin jiyîn? Diyare ku dersên pêwîst ji tiştên hatine jiyîn dernexistine. Heta demokrasî pêk neyê, ev çand nekeve hindirê pergalê, hilbijartinên riyalî pirsgirêkên gel çareser nakin. Li Tirkiyê jî zagon hene û HDP’ê nêzî sed şaredarî qezenç kiribû. Hikumetê bi fermanekî dest danî ser tevahî şaredariyan.

Di vî alî de pêwîste gel xwedî li demokrasî û vîna xwe derbikevin. Eger gel li ber xwe bidin û xwedî li vîna xwe derkevin kes nikare destkeftiyên wan ji dest bigire.